Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 67
15'ê Tîrmehê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

18'hemîn Salvegera Terorkirina Şehîdên Viyenê Hatin Bibîranîn

Îsal jî di roja 22'ê Pûşperê de, li tev bajarên Kurdistana Îranê û welatên Ewropayê, Dr. Qasimlo û hevalên wî hatin bibîranîn û di çalakiyên berfireh ên şermezarkirinê de, rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî ya Îranê hate şermezarkirin ... **Rapor R. 4**

QASİMLO Dİ RÊBAZA XWE DE ZİNDÎ YE

Peyama Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya 18'ehemîn ...

2

Dr. Yekta Uzunoglu:
"DR. QASİMLO ROJHİLATNAVÎNTÎ DİFİKİRİYA"

5

Hilbijartina Seraserî Li Turkiyê Û ...

7

HUNER



9

Şanogerê Kurd, Fatih Salihî, di hevpeyvînekê ...

10

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDK Îranê:



Xelkê Kurdistanê di 18'hemîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo de carek din wefadarî û emegnasiya xwe bo wî rêberê mezin û partiya wî dan xuyakirin

Serbarê amadebaşiya hêzên rejîmê û gef û givaşên wan li ser xelkê Kurdistanê, roja 22'ê Pûşpera îsal jî weke du salên borî, xelkê welatparêz û azadîxwaz li gund û bajarên Kurdistanê de bi pêşwaziya bangewaza partiya xwe, PDK Îranê ve hatin û bi nîşandana liv û hereketên nerazîbûnê wekî, nivîsîna dirûşman li ser der û dîwaran, belavkirina wêneyên şehîd Qasimlo, daxistina dukan û bazaran û bi xasmanî temirandina çirayên malên xwe li seet 10'ê şevê de bi midehê 3 deqîqan, nerihetî û bêzariya xwe ji rejîma Komara Îslamî bona terorkirina rêberê mezin û navdar yê gelê kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo xuya kirin.

Her bi vê boneyê li hin bajarên weke Mehabadê de, meşa aram û aştîxwazane ya xelkê kete ber êrîşa hêzên kirêgirtî yên rejîmê û di encam de hejmarek ji xelkê, birîndar û şehîd bûn, hejmarek jî hatin girtin û rapêçî girtîgehan kirin.

Bêşik ew meş û hereketên xelkê kurd ji hişyarî û pêgihîştina wan ve çavkaniyê digre û nîşan dide ku teror û tirsandina wan û nemaze rêberên wan, ne tenê her nabe sedema biçokdehatin û destberdan ji mafên rewa û berheq yên xwe, belkî li ser domandina rêbaza Dr. Qasimlo û partiya xwe heya gihîştin bi armancan mikumtir dike.

Em, hişyarî û pêşwazîkirina xelkê demokrat û azadîxwaz yê Kurdistanê ji gaziya partiyê bilind dinirxînin û spas û pêzanîna xwe jî pêşkêşî hemû gelê kurd bi taybet ciwanan dikin, herweha serxweşiyê jî ji malbatên şehîdên vê berxwedanê dişînin û hêviya baştirbûna her çiqas zûtir ya birîndaran bi hêvî dixwazin.

Serkevtin ji bo we xelkê qehreman yê Kurdistanê

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Deftera Siyasî
15.07.2007
24.04.1386

www.arsivakurd.org

Peyama Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya 18'hemîn Salvegera Terorkirina Dr. Ebdulrehman Qsimlo

Hevwelatiyên xweştevî!
Hevalên hêja!

Di 18'hemîn salvegera şehîdkirina rêberê mezin û navdar yê Kurd **Dr. Ebdulrehman Qasimlo** de em li vir kom bûne heta serbarê tewandina serê kurnoj û hurmetê ji bo fîdakarî û xwegorîtiya şehîdê nemir Dr. Qasimlo û hemû şehîdên gel weke salên çûyî, gerrekê di nava beşek ji bîr û ramana pêşketinxwazane ya wî bidin, bona vê çendê ku em bikin ceribîna rêya xebata xwe û soz û peymanê tevî canê paqij yê wî nû bikin ku li ser rêbaza neteweyî û demokrat û aştîxwazane ya wî berdewam bin û heya gihîştin bi xwezî û hêviyên wî ku rizgarî û serbestiya neteweya bindest û demokratxwaz ya Kurd bû, bo demkê ji xebat û tekoşînê nerawestin.

Gelî hevalan!

Li ser zanayî û lehengiya Dr. Qasimlo pir hatiye gotin, lê dîsan jî tiştên negotî ji karîn û şiyanên wî gellek in û hêvî dikim bi derbasbûna demê roj bi rojê aliyên jiyana wî rêberê leheng yê neteweya me ji bo nifşa ciwan û nûgihîştî bêtir ron û kifş bibe Bona vê çendê ku di rêya gihîştin bi azadî, demokrasî û mafê diyarîkirina çarenivîsê ji bo gelê Kurd wane û şîretên wî bikin bi çirayê rêya xebata xwe.

Dr. Qasimlo di xebata hundirîn de îmaneke kûr bi parastina azîn, usûl û pirensîpên demokratîk hebû û dengê endamên partiyê bi çavkaniya rewa û berheqiya rêberiyê dizanî, lewra di hemû kongreyan de, ewilî di hilbijartina rêberiya partiyê de beşdarî dikir û piştre jî di nava rêberiya partiyê de xwe ji bo sekreteriya giştî berbijar dikir. Ew li dijî her cure mekanîzmeke lihevkirinê bû ku kes yan girûpek bixwaze xwe bi ser partiyê de bisepînin (ferz bikin) û heta mabû li dijî wan kes û destekan xebat dikir.

Dr. Qasimlo dijberê hizra eşîretî û herêmçêtiyê bû û bi tundî li hember vî cure fikirîna kevn û paşverû disekinî, lewra pir caran dikete ber şopa serkêşên vê bîr û ramana paşmayî, lê wî ku îman û bawerî bi rastî û heqaniyeta hizr û ramana xwe hebû, ji gef û êrîşa neyar û dujminan tirsek nebû (bêminet bû).

Hevalên qedirgiran!

Dr. Qasimlo digot ku demokrasî ji bo PDK Îranê armanc û hedef e û li ser vê baweriyê bû, demokrasî çeka gelên bindest û yek ji wan gelê Kurd e ku bi sedema parvekirina Kurdan bi ser çar welatan de û nebûna derfet û delîveya pêkhatina dewleta serbixwe heya niha nekariye bi mafê diyarîkirina çarenivîsê bigihîje, mafek ku heqê berheq yê tev takekes û neteweyeke bêparkirî de bigihîjê de. Her di vê demê de jî, bawerî bi mafê diyarîkirina çarenivîsê bi maneya hevgirtinê ji bo neteweya parçekirî ya Kurd hebû. Ew bawer bû Kurd ji bo gihîştin bi armancên xwe, divêt gotarekê hilbijêre ku dunyaya derve piştgiriyê jê bike. Ev baweriya wî jî ji vê rastiyê çavkanî girtibû ku Dr. Qasimlo hêz û karîna Kurdan, helwest û berjewendiyên cîhanî nas dikir, loma digot: "Kurd ji bo gihîştin bi armancan divêt xebata xwe di çarçoveya demokrasî û mafên mirovan de bas bikin û pêşve bibin".



Birêz Têmûr Mistefayî:

"Bila nifşa ciwan û nûgijîştî ya îro bîr û ramanên rêberê navdar yê neteweya Kurd, Dr. Qasimlo bikin çirayê rêya xebatê"

Bi dîtina Dr. Qasimlo, demokrasî di welateîk pirneteweyî weke Îranê de, wateya parvekirina desthilatê bû ku di sîstemeke demokratîk ya federal û li ser bingeha mirovî, xuya û berbiçav dibû. Sîstemek ku têde çi cure ferq û cudahîdananeke neteweyî, zayendî, tex û çînatiyê di holê de nedibû. Dr. Qasimlo di vî warî de digot: *"Bêy hebûna rejîmek demokrat ya rasteqîn mafê gelê Kurd dabîn nabe û bê dabînbûna mafên neteweyî yên gelê Kurd jî, rejîm bi wateya xwe ya rastîn û kemilî, demokratîk nabe."*

Dr. Qasimlo pêşkevtîbûna civak û hemû tevgereke siyasî bi radeya beşdariya jinan di wê civak yan tevgera siyasî de girê dida û di vê derbarê de digot: "Her çiqas jin di kar û xebatên siyasî û civakî de zêdetir beşdar bin, civak pêşketîtir e û her çiqas di tevgera siyasî ya neteweya me de, jin çalak û xebatkar bin, tevgera me pêşketîtir û bextê serkevtina wê bêtir e". Herwiha ciwan bi çavkaniya hêza gel û hêviya pêşeroja welat dizanîn.

Dr. Qasimlo hogirê diyalog û pêwendiya germ û gurr bû, ew sefîrekî çeleng û xwedî hest ji bo tevgera Kurd bû û bi wê zanayî û têgihîştina ku hebû, gellek baş dikarî derd, kul û elemên neteweya xwe bigehîne guhê xelkê dunyayê û piştgirî û hezkirina wan bo aliyê tevgera Kurd rabikêşîne. Di dema jiyana serbilindane ya xwe de, pir dostên wefadar û navdar weke xatûna **Madam Mîtran**, **Dr. Bernard Koşner**, **Kirîs Koçera** û sedan kesên din bo piştevanî ji tevgera Kurd peyda kirin. Wî rêya PDK Îranê û partiyên din ên Kurdî ji bo Rêxistina Enternasyonala Sosyalîst vekir û endambûna Partiya Demokrat di vê rêxistina navneteweyî de, encamên hewl û tekoşîna vî leheng û mêrmaqûlê dîroka gelê me ne.

Hevalên hêja!

18 salan berî niha dêwên şer û kundên malwêranî û xirabiyê, mamostayên terorê, Dr. Qasimlo li ser maseya gotûbêjê ji me standin û wisa difikirîn, bi terorkirina Dr. Qasimlo dê bikaribin bigihîjin armancên xwe yên qirêj û mirar ku jarî û lawazkirina tevgera Kurd e. Lê em dibînin Dr. Qasimlo heke çi bi cendek di nava me de nemaye, lê bi bîr û bawerî her rêber e û di nava me de ye. Ciwanên nûgihîştî ên welat, waneyên xebata xwe li dijî rejîma dîktator ya Îslamî ya Îranê û di rêya rizgarî û demokrasiyê de bi dirûşma ***Qasimlo, Qasimlo rêya te dê her bidome,*** dest pê dikin.

Çiqas kor, nezan û nefam bûn yên ku bawer dikirin bi şehîdkirina Dr. Qasimlo, xebat ji bo gihîştin bi demokrasî û mafê gelê Kurd, dê ber bi qels û lawaziyê biçe, ew çekçekûle bûn ku nedîdîtin Qasimlo rêbazek diyarî kiriye, azîn û usûlek ji xebatê re daniye û partiyek perwerde kiriye ku bi van reşebayane nahê lerizînê û rêya xebatê her çiqas dijwar û tejî kosp û asteng be jî, heya serkevtinê dê bidomîne.

Piştî ku Dr. Qasimlo di 22'ê Pûşper (13'ê Tîrmeh)a 1989'an de hate terorkirin, ev roje ji xelkê Kurdistanê re yê bûye roja xebat û berxwedanê û ciwanên biwêr û xebatkar li dijî vê terorê ji bo bibîranîn û nûkirina soz û peymanê tevî canê paqij yê Dr. Qasimlo, dest didin awayên cur bi cur ên xebatê li dijî rejîma kevneperest û paşverû a Komara Îslamî û jêre diselimînin ku Qasimlo heke çi bi cendek di nava me de nemaye, lê di bîr û ramanên xwe de her zindî û rêber e.

Du salan beriya niha bû ku xelkê xebatkar yê Mehabadê di roja 22'ê Pûşperê de, hemû dukan û bazar daxistin û piştî vê rojê bo heyamê çil rojan li ser rênîşaniya Partiya Demokrat, her demê li bajarekê li seranserê Kurdistana Îranê ev nerazîbûn di şekl û awayên cuda cuda de tevî serkut û qirkirina tund û bêrehmane ya rejîmê û şehîdbûna

www.arsivakurd.org

hejmarek berçav ji xebatkaran û birîndarbûna hejmareke zêdetir û girtina hezaran kes û xistina wan bo nava girtîxaneyan û îşkenceya wan dom kir. Sala borî jî li ser daxwaza PDK Îranê di roja 22'ê Pûşper (13'ê Tîrmeh)ê de, gel dukan û sûk (bazar)ên xwe daxistin û di şevê de jî bo heyamê 3 deqîqeyan çirayê malên xwe temirandin. Ev liv û meşa nerazîbûnê di demekê de bû ku xelkê Kurdistanê ji qirkirin û bêrehmiya hêzên rejîmê kêmtirîn şik û guman tune bûn, lê dîsan hantne ortê, heya bi dijmin biselimînin ku ew li ser rêbaza Qasimlo ku rêbaza rizgariya gel û dabînbûna demokrasiyê ye, biîsrar in û hazir in di vê rêyê de hemû hezîneyekê bidin. Di cihê xwe de ye ku ji vê tirîbûnê ve em bi taybetî silavan ji bo şehîd, birîndar û girtiyên siyasî yên wan meşên nerazîbûnê bişînin û ji wan re bibjin bila şehîdên nemir, girtiyên azar û îşkencedîtî erxayîn bin, gellek nakişîne ew armancên ku we xwe di pêxema wan de gorî kir, azar, êşandin û îşkenceya kirêgirtiyan we bi can û dil qebûl û tab kir, dê bihên cî û gel di bin siya hewildan û fîdakariya we dê rizgar û azad bibe.

Beşdarên hêja!

29 salan berê gelên Îranê di encama xebateke netirsane de di roja 22'ê Rêbendana 1357 (11.02.1979)'an de, tomara rejîma Paşatiyê têkve pêçan, bi wê hêviyê ku berhema wê xebat û tekoşînê hatine serkara rejîmekê jê bikeve ku têde xelk bi azadî, ewlehî û asûdeyiyê bigihîjin. Lêbelê pir nekişand Xomeynî û dezgeha olî ya Îranê dest bi ser şoreşê de girt û her di yekemîn rojên li pey şoreşa Îranê de, civaka Îranê û dinyayê li gor baweriya olî ya xwe bi du beşên heq û "batil" (neheq) parve kirin û pêka vê dîtin û ramanê jî diviya heya sepandina heq li ser neheqiyê bixebite. Alava vê tekoşînê jî li gorî vê nêrîn û dîtinê "cîhad" (zebar) e ku yekem qonaxa vê cîhadê jî di 28'ê Gelawêja 1358 (19.08.1979)'an li dijî gelê Kurd li Kurdistana Îranê ji aliyê Xomeynî ve hate îlankirin. Di encama wê fermanê de, can û malê xelkê Kurdistanê ji Pasdarên cehl û nezaniyê hate helalkirin û çi cinayet di vê derheqê de ji aliyê Spaha rejîmê ve nehatin meşandin!. Her li gorî vê ramana paşverû, fermana şandina şoreşê bo derve ji aliyê Xomeynî ve hate dayîn ku di encama van nêrînane de, şerê 8 salî yê Îran û Îraqê jê ket ku têde bi milyon mirovan jiyana xwe ji dest dan û bi milyar Dolaran jî ku divêt mesref û xerca avadanî û rihetiya xelkê bihata kirin, xerca vî şerê bêencam hate kirin.

Melayan di van 29 salan de ji bo domandina desthilata reş a xwe, fend û fêlên cur bi cur bikar anîn û kar gehandin cihekê ku bi gotinên rojpesend û anîne rojeva reform û guhertinan di çarçoveya rejîmê de komek zaf ji xelkê hundir û heta binav Opozîsyona derve û dinyaya vêc û berjewendîxwaz ya Rojava jî dilxweş kiribû. Anîne berbasa van senaryoyane ji bilî parvekirina kar di nava Meleyan de, tiştek din nebû.

Niha li pey 29 salan, Mehmûd Ehmedînejad yê vegeriyaye ser rûçikê rasteqîn yê Komara Îslamî û yê dest daye fitne afirandinê li herêmê, piştgirîkirin ji destek û girûpên terorîstî, maytêkirin di kar û barên dewletên herêmê û hewildan ji bo bidestxistina çekên Etomî û gefa ji holê rakirina endamek Neteweyên Yekbûyî li ser rûyê xarîteya coxrafiya dinyayê.

Îro ku cîhanê seh bi tirs û bixeterbûna rejîma Komara Îslamî kiriye, xebat ji bo meharkirina vê rejîma serberedayî roj bi rojê zêdetir dikeve rojeva civaka navneteweyî, lewra ye heta niha ji aliyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve di 2 biryarnameyên 1737 û 1747'an de, radeyek ji cezayên aborî bi ser de hatine sepandin û rejîm serbarê van zext û givaşane jî, li ser serkêşî û bersivnedayîn bi civaka navneteweyî û domandina meyandina Uraniyûmê berdewam e û didomîne. Gelaleya sêyem ya dorpêçan li ser rejîma Komara Îslamî ya Îranê li ber nirxandin û gotûbêjan de ye û li gor helwestên herî dawîn yên Wezîra Karê Derve ya Amerîkayê, pirsa êrîşa leşkerî bo meharkirina rejîmê her wisa di bername û destûra karê me de ye û em mêze dikin ku guherîna vê rejîmê yê ketiye rojeva civaka navneteweyî.

Heke rejîm di warê navneteweyî de rastî kirîzan hatiye, di warê hundirîn de jî yê tûşî kirîz û pirsgirêkên cur bi cur ji qeyrana meşrû û berheqiyê bigire heya kirîza aborî, civakî û wd... bûye.

Hevalên rêzdar!

Îran ku bi sedema çavkaniyên nift (petrol)ê piştî Erebistana Seûdî û Kanadayê di cîhanê de pileya sêyem û di warê gazê de jî piştî Rûsyê pileya duyem di cîhanê de heye, ji ber nezanî û kêrhatînebûnê ji aliyekê, ji aliyê din ve seba siyaseta ne durist ya arşîe û kirîz afirandinê û ketina rejîmê di benda baykot û dorpêçan ji aliyê saziyên malî (diravî) ên navneteweyî û girêdana îtibara pereyan û nehatina sermayeyên biyanî ji bo welat, rastî kirîzan bûye ku mixabin beşek ji ziyan û zexta van kirîz û qeyranane bo tex û qatên feqîr, belengaz û kêmdahat vedigere.

Di bûyera herî nû de, bi sedema cîrekirina benzînê ku ji şeva sêşem, 05'ê Pûşper (26'ê Hezîra)a îsal ji aliyê rejîmê ve hate îlankirin û aloziyek zaf li piraniya bajarên mezin ên Îranê de derket holê, li Tehranê agir berdane dehan benzînxaneyan, li Tewrêzê xelkê dest bi ser benzînxaneyan de girt û benzîn erzantir ji nirxa dewletî, lêtra wê bi 80 tûmenî ji otombêlan re difirotin. Bi kurt û kinî, ev pirsgirêk bû sedema kuştina çend kesan. Rejîm ku pêşdîtina hegera dubarebûna van arîşe û pirsgirêkane dike, derdora hemû benzînxaneyan tejî ji hêzên întîzamî û ewlekariyê kirine.

Kongera Amerîkayê jî di vê dawiyê de gelaleyek pejirandiye ku firotina benzînê ji bo Îranê ku nêzîkê 50 ji sedî ya pêwîstiya xwe li derve dabîn dike, dixe nava çarçoveya dorpêçên xwe û îlan kiriye her welatek benzînê bifiroşe Îranê, dê bikeve ber baykot û dorpêçên Amerîkayê. Nebûna benzînê di welatekê de ku sêyemîn paşkevta çavkaniya binerdê ya petrola dinyayê heye, heke nîşana kêrhatînebûn û nezaniya desthilatdarên rejîmê nebe, nîşaneya çi ye?

Pirsgirêka nebûna benzînê bi qasekê girîng e ku di dema herî zû de bandora xwe da kifşê û buhaya tev alav û amûr û tiştên bazarê bire serê ku ev yeke zext û givaşeke zaf dixe ser xelkê û nemaze çîn û texa hejar û destkurt ku piraniya xelkê welat pêk tîne.

Di heyamê bihurî de ji aliyê Melekeya Birîtaniyayê ve nasnavê "Sir" ji Selman Ruşdî, nivîskarê pirtûka Ayetên Şeytanî re bi sedema xizmetên wî bi wêjeya Birîtaniyayê hate bexşîn ku bû sedema dijkiryar û helwesta tund a rejîma Îranê ku jêve bû dana vî nasnavî ji navhatî re sivikatî ye bi Ola Îslamê, di vê derheqê de Hedad Adil, Serokê Civata Îslamî a rejîmê ragihand ku ev kiryare bê bersiv namîne. Ji aliyê girûpên Îslamî ên rejîmê ve jî xelata kuştina Selman Ruşdî zêdetir bû û rejîmê bi gefa kuştina hevwelatiyekî welateke din peyama şandina zulmê û şikandina pênivîsê nivîskarên xeyrî Îranî jî ji bo derve dişîne.

Di warê civakî de jî bi sedema bêkarî, bê hêvêvîtî, givaşa vê hesab li ser jiyana xelk, jiyana di bin hêla xizaniyê de, bûyerên civakî wekî xweşewitandin, îtiyad, berdan û hilweşîna malbatan roj li pey rojê zêdetir dibe, ev pirsgirêkên civakî zêdetir di nav nifşa 20 – 30 salî de ne û roj li pey rojê temenê tûşbûyiyan bi genadeliya civakî kêmtir dibe û li gor serhejmariyên rejîmê, niha du milyon û nîv bikarînerên madeyên sirker di Îranê de hene ku piraniya herî zaf ji nifşa ciwan pêk hatiye.

Serbarê vana jî, maytêkirinên rejîmê di jiyana malbatan de ye, destêwerdan li şêwaza lixwekirina kincan û di çend mehên borî de riftarê rejîmê tevî wan jinên ku lixwekirinên Îslamî liberçav negirtine, gellek hovane bûye. Di nûtirîn biryarê de, rejîmê ji bo kincên xelkê şekl û metodên cur bi cur dayîne terziyan û navê kincên neteweyî li ser danîne ku ji vî heyamî şûn de terzî divêt kincan bi wî awayî bidirûn, hekene dê rastî cezayên rejîmê werin.

Hevalên hêja:

Di 18'hemîn salvegera şehîdên Viyenê de, ji aliyê Deftera Siyasî a PDK Îranê ve silavan dişînin bo nemir Dr. Qasimloyê hertim zindî û kekê Ebdula Qadirîazer û em soz û peymanê tevî canê paqij ê wan nû dikin ku hetanî serkevtinê rêvîngên emegnas yên rêya wan ya pîorz bin

Hevrêyên birêz!

Li ciyê xwe de ye ku li vir bîranînekê ji rêberekî xebatkar yê din, yarê wefadar bi rêbaza Dr. Qasimloyê rêber, kekê **Selam Ezîzî**, endamê Deftera Siyasî yê partiya me ku di 24'ê Pûşpera 1378'an a Rojî(15.07.1999)'an de, bi sedema sekteya mejî wexera dawiyê kir û bo hertim xatira xwe ji me xwest.

Kekê Selam di sala 1358'(1980)an de, wê demê rû ji refên Pêşmrgatiyê kir ku serokê Dadgeha Bokanê bû. Wî ew jiyana xweş û ew berpirsiyariya giring bi cî hêla û hate nav refên Pêşmergatiyê hetanî ku zanebûn û karîna xwe bixe xizmeta berbipêşveçûna armancên partiyê. Wî, wê dema ku di refên partiyê de bû, pileyên berpirsiyariyê yek li pey hev bezandin û ji payîza sala 1368'(1989)an ve, hetanî dema xatirxwestinê ji partî û hevçeperên xwe, endamê jêhatî û layîq ê Deftera Siyasî ya partiyê bû. Kekê Selam her ji wê dema ku rêberekî zana û xwedî şiyan bû, tevî vê çendê jî mirovekî xakî û peyvxweş û liser dilan bû û baweriyeke kûr bi rêberiya bi kom hebû, dijî tekrewî û dîktatoriyê xebat dikir. Rêvîngekî wefadar yê rêya Dr. Qasimloyê rêber bû.

Wê dema ku Dr. Qasimlo ji bo zindîragirtin û livandina partiyê, xebat dikir, kekê Selam Ezîzî yek ji piştevanên herî bihêz yê wî rêberî bû. Ew piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo jî yek ji rêvîngên rêya mamostayê rêber, Dr. Qasimlo bû.

Sed heyf û mixabin bona ji dest dana rêberên wek kekê Selam.

Silav ji hizra wî û berdewam be rêya wî

Silav ji PDK Îranê rêber û rêkxerê tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd

Her bijîn û serkevtî bin

www.agirikurd.org

Carek Din Peyman Tevî Şehîdên Viyenê Hate Nûkirin

Di bîranîna 18'hemîn salvegera terorkirina rêbêrê mezin ê Kurd Dr.Qasimlo û hevrêyê wî Şehîd Ebdula Qadirîazer de, re û resmek di Binkrya Deftera Siyasî ya PDK Îranê de, birêve çû.

Rê û resm piştî nîvroya roja înê, 22.04.1386(13.07.2007)'an, di hal û hewayekî pir ji kul û kuvan û çavên bi hêsir û dilên xembar, lê hêbîdar de dest pê bû.

Di destpêka rê û resmê de, nimayişeke takekesî ji aliyê Fatih Salihî ve, hate nîşan dan û piştre bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb"ê û ragirtina deqîqeyekê bêdengiyê ji bo bibîranîna canê paqij û nûkirina peymanê tevî armancên bilind ên Şehîdên rêya azadiya Kurdistanê, rê û resmê bi fermî dest bi karê xwe kir.

Di doma rê û resmê de peyama Deftera Siyasî ya PDK Îranê, ji aliyê Têmûr Mistefayî, endamê Polîtbîroya PDK Îranê ve hate pêşkêşkirin. Deqa Peyama Deftera Siyasî di rûpela 2-3 ya vê hejmara Agirî de hatiye.

Di dawiya peyama Polîtbîroya PDK Îranê de, bo car din weke hemû salê Şehîd Seyîd Selam Ezîzî, endamê birûmet û biemeg yê Deftera Siyasî ya PDK Îranê, hatibû birîranîn ku roja 24'ê Pûşperê 8'emîn salvegera ji destçûna wî ye.

Aliyên din ên rê û resma han wiha hatibûn xemilandin:

-Sirûda "Qasimlo", ji aliyê kora hunerî ya PDK Îranê ve.

- Kilamek ji aliyê Bêhrûz Lutfî ve.

- Rêgirtin ji 2 hevrêyan bi navên Mihemed Weysî û xatûna Beyan Qadiriyan ku ji bo bilindragirtina bîr û armancên Dr. Qasimlo, li Hewlêrê heta Koyê bi pêyan hatibûn.

-Sirûda "Ey Mamostay Mezin û Zana", ji aliyê zarokên Navenda 1'ê ya Kurdistanê ve.

-şanoyek li ser navê "Ême le ser rêbazî ew qeutabxaneyîn"(Em li ser rêbaza vê xwendinegehê ne", ji aliyê koma Şanoyê ya "Kotrekanî Tarawge"(Kevokên Xerîbiyê)ve.

Rê û resm êvariya heman rojê bi nûkirina peymanê tevî armancên Şehîdan û dana vê sozê ku heta jiyan hebe rêya Şehîdan jî dê her dom hebe, bidawî hat.

Li Ser Rola Dr. Qasimlo Di PDK Îranê Û Tevgera Kurd De Dormêzek Hate Lidarxistin

Bi boneya 18'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo ji aliyê rejîma terorîstî ya Komara Îslamî ve, dormêzek li ser **rola Dr. Qasimlo di PDK Îranê û tevgera Kurd de**, roja sêşem 10'ê Tîrmeha 2007'an ji aliyê Komîsyona Perwerde û fêrkirina PDK Îranê hat lidarxistin. 3 mêvanên dormêza han ku li ser mijara civînê axivîn ev bûn: Rêzdaran **Kawe Behramî**, **Çeko Rehîmî** û **Mihemedsalih Qadirî**, endamên Komîteya Navendî ên PDK Îranê.

Di vê dormêzê de, birêz Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Mistefa Hicrî û hejmarek ji endamên rêberî û Kadro û Pêşmerge beşdar bûn.

Di dormêzê de, ji aliyê birêveberên dormêzê ve bi hûrî û berfirehî rola Dr. Qasimlo di PDK Îranê û tevgera Kurd de di warên vegerandina serxwebûna siyasî ji bo PDK Îranê, bername û Pêrewa hundirîn, anîna Sosyalîzma Demokratîk weke armanca pêşeroja partiyê, navneteweyîkirina pirsgirêka Kurd, tekezkirin li ser diyalog û gotûbêjê, nehêlana takekesperestiyê, cihgirkirina exlaq di siyasetê de û wd... hate şirovekirin.

Her wiha birêveberên dormêzê bal kişandin ser taybetmendiyên bilind ên Dr. Ebdulrehman Qasimlo wekî, demokratbûn, aştîxwazbûn, bawerî bi wekheviya mafê jinan û mêran û parastina mafên mirovan û wd...

Dormêza han piştî 2 seetan bi dawî bû.

Nerazîbûna Xelkê Li Dijî Komara Îslamî Bi Boneya 22'ê Pûşperê

Bi boneya 18'hemîn salvegera terorkirina **Dr. Qasimlo** û **Ebdula Qadirî Azer**, serbarê gef û givaşên hêzên rejîmê, lê xelkê netirs, emegnas û welatparêz yê Kurdistanê li 22'ê Pûşperê de li gellek bajarên Kurdistanê weke Mehabad, Seqiz, Sine, Bokan, Pîranşar, Kirmanşan û Gîlanxerbê de piraniya dokan û bazar daxistin û bi vî awayî nerazîbûna xwe ji rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî dane eyanê.

Herweha xelkê welatparêz û Pêşmergeperwer ê Kurdistanê li piraniya gund û bajarên Kurdistanê de pêşwazî ji gaziya partiyê kirin û seet 22'ê şeva 22'ê Pûşperê çirayên malên xwe bo 3 deqîqeyan temirandin.

Hêjayê gotinê ye ku li gellek bajarên Kurdistanê de rejîmê ji tirsan de rewşa awarte ragehandibû, lê dîsan jî ciwanên azadîxwaz ala Komara Îslamî jî anîne xwarê.

Dr. Yekta Uzunoglu:

"DR. QASİMLO Jİ GELLEK DEMOKRATÊN NAVDAR ÊN EWROPÎ ZÊDETİR DEMOKRAT BÛ. DEMOKRASÎ PERÇEK Jİ KESAYETİYA WÎ BÛ"

Dr. Yekta Uzunoglu (Geylanî) di sala 1935'an de li Farqîna Kurdistana Bakur ji dayîk dibe. Di sala 1971'an de ji bo xwendinê tê Fransayê. Ji 1973 ta 1979'an li zanîngeha Tiba Universal dixwîne û dibe doktorê tendurustiyê. Piştî destpêbûna şerê rejîma Îslamî ya Îranê li dijî Kurdan, tevî komek bijîşkên Rêxistina Doktorên Bê Sînor ji bo alîkariya dermanî diçe Kurdistana Îranê û Pêşmergan derman dikin. Ji bilî doktorî di warê tibê de, zanista aborî jî xwendiye. Sala 2006'an, xelata herî girîng ya welatê Çek (Frantisek Kriegle)ê wergirt. Dostê qedîm, dehsalan û nêzîk yê Dr. Qasimlo û malbata wî ye. Niha li Komara Çekê dijî. Dr. Yekta zewicî ye û bavê 2 zarokan e. Wekî aborînasekî pirspor û serkevtî li gellek welatên cîhanê beşdarî konferansên navneteweyî yê aboriyê dibe.

Bi boneya 18'hemîn salroja terorkirina hovane ya Dr. Qasimloyê nemir, min xwast ku li ser çend aliyên kesayetî, xebat û ramanên Şehîd Dr. Qasimlo, raman û nêrînên vî kesayetiyê Kurd yê navdar ji bo we xwendevanên hêja bidim xuyakirin.

Hevpeyvîn/ Azad Kurdî

...

Hevpeyvîna me taybet li ser kesayetiya Dr. Qasimloyê nemir e. 13'ê Tîrmeha 2007'an, 18 sal bi ser şehîdkirina nemirovane ya Dr. Qasimlo ji aliyê terorîstên Komara Îslamî re derbas dibe. Hûn yek ji dostên nêzîk yên Dr. Qasimlo bûn. We çawa ew nas kir? pêwendiyên we bi wî re çawa bûn?

Di sala 1972'an de ku ez bo xwendinê hatim Çekoslovakya, min xwendekarên Kurd ên Rojhilatê jî nas kirin. Wek **Mihemed Muhtedî**, **Hacî Ehmedî**, **Selîm Babanzade**, **Hesen Qazî** û wd. Min wisa dizanî ku rehmetiyê Şehîd Dr. Qasimlo jî li Pragê ye. Lê ew wê demê li Îraqê bû. Carna diçû û dihat Pragê. Ez li xaniya xwendekaran de li Prag 6 dimam. Di sala 1973'an de rojekê di zanîngehê de hevalekî min ê Çek – xwendekarê Tendurustiyê – hat ba min û got: "Tu Kurd î?". Min berisv da: "Dewleta me tune be jî, ez Kurd im". Got:" Ez Kurdan baş nas dikim, min pirtûka Dr. Qasimlo, **Kurd û Kurdistan** xwendiye û bavê min hevalê Dr. Qasimlo ye. Wan bi hev re zanîngeh xwendine û hêj bi hev re ne. Tu naxwazî îşev werî mala me, mala me ji Xaniyê xwendekaran ku tu dimînî 150 m dûr e û mala Dr. Qasimlo jî li kêleka me de ye." Lê ew tişt bi dengekî nizm û wek tiştekî dizî ji min re got. Wê şevê ez çûm mala wî. Li wir hîn bûm ku bavê wî aborînasekî gellek navdar e di warê aboriya ziraatê de, piraniya reformên ziraatê li Çekoslovakya û li Polonyayê wî çê kirine. Li wir çend xanî hebûn. Di wan çend xaniyan de tenê aborînas û malbata wan diman û tevde hevalê rehmetiyê Şehîd Dr. Qasimlo bûn, bi hev re zanîngeh xwendibûn, bûbûn pirspor, di zanîngehên herî navdar ên aboriyê de bibûn dersdar heta sala 1968'an û tevde bi hev re dijî ketina leşkerên Soviyetê sekinîbûn, serhildabûn. Wan ez bi malbata Şehîd Dr. Qasimlo re dam naskirin ku cîranê wan, cîranê min jî bûn. Ta ku Dr. Qasimlo ji Îraqê vegeriya û me hevdu nas kir. Êdî bi malbata wî re em baş bibûn nas. Ez bi carekê de ketibûm nav civaka aborînasên herî navdar û dijî Soviyet, dijî dîktatoriyê.

Qedr û qîmeta Dr. Qasimlo li ber çavên hevalên wî yên aborînas ên Çek bêhempa bû, ji ber ku ew wek *biyaniyekî* di dagirkirina Çekoslovakyayê ji aliyê leşkerên Soviyetê de li dijî vê dagirkirinê serê xwe rakiribû û di kêleka hevalên xwe de ketibû nav şerê dijî dagirkeriyê.

Lê Îraniyên din – ku endamên Partiya "TUDEH" bûn – li ber çavê ilumdarên Çek de *îxanet* kiribûn gelê Çek, ji ber ku dijî dagirkirinê der neketibûn.

Bi giştî we çi pênase û nirxandinek li ser kesayetiya rêberê leheng yê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo heye?

Di Şibata sala 1975'an de, ez û Hecî Ehmedî, Memo Calî û çend xwendekarên Kurd çûn sefareta Swêdê li Pragê û me dest bi girevagirtina rojiyê kir. Bi vê gireva rojiyê me xwest em hevkariya welatên Sosyalîst bi Sedam Husên re protesto bikin. Piştî vê protestoyê ku wê demê rastî di dinê de deng dabû – ji ber ku cara yekemîn di welatekî sosyalîst û dîktator tiştekî wisa pêk hatibû – ez ji berê zêdetir ketim nava grûb û saziyên ku dijî komunîzmê şer dikirin. Ji ber ku ez xwendekar bûm, di nav civakê de zû dikaribûm winda bibim. Lê rewşa Dr. Qasimlo cuda bû. Gava ku dihat Çekoslovakyayê, îstixbarata komunîst 24 seet dû wî de bû. Wê demê min çapxanekî dizî – illegal – bi navê **Çapxana Ararat** yanî **Çapxana Agirî** vekiribû. Min pirtûkên Kurdî, Çekî li ser Kurdan, Fransizî li ser Kurdan û wd... bi dizî çap dikir. Rehmetiyê Dr. Qasimlo ecêbgirtî û hehrî dima ku xwendekarekî ciwan van tiştan di nav welatekî Komunîst de çawa dikare bike. Ji min xwest ku ez belevok, beyanname, dazanînên Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê jî çap bikim – ji ber ku ew tim di bin kontrolê de bû û mecala wî ya çapê tune bû -. Min çap dikir û tim bi awayekî dizî xwe digihîjand mala wî. Bi vê minasebetê em gellek nêzîkê hevdu bûbûn û ev bûyeran şansê naskirina wî dabû min.

Dr. Qasimlo berî her tiştî kesayetekî demokrat bû. Bi her tiştê xwe û li her cihekê demokrat bû. Di nav civakê de, di nav hevalên xwe de, di nav malbata xwe de, bi hebûna xwe demokrat bû. Wî wek demokratekî bêhempa di nav derya îdeolojiyên dîktator de pir caran tek û tenê şer dikir. Wî ku di welatekî dîktator/rast, rejîma Şah/ de mezin bûbû, di welatekî dîktatorî /çep, komunîst – Çekoslovakya/ de salan xwendibû, lê dîsa jî ji gellek demokratên navdar ên Ewropî zêdetir demokrat bû. Demokrasî perçeyek ji kesayetiya wî bû.

Ya hêşta girîng ew e ku Dr. Qasimlo nîşana mirovayetiya nûjen bû. Bo wî ji her tiştê bilindtir, Mirovayetî bû. Ne nîjad, ne ol, ne îdeolojî jê re wek mirovayetiyê girîng nebû. Tişta herî bilind bo wî mirovayetî bû. Ji ber vê yekê jî heval û hogirên wî ji her nîjad, ol û îdeolojiyê hebûn.

Wî îdeolojî, ol û nîjad wek, sedek di nav danûstandinên mirovan de nedîtiye. Wî ji mirovan re li gor van etîketan yan nîşanan qîmetekî zêde yan kêm nedaye. Naxêr, bo wî girîngtirîn tişt kalîta mirovatiya şaxsan bû ne ku ol, îdeolojî yan jî nîjadê/a wan.

Bê guman ji ber van aliyên kesayetiya Şehîd Dr. Qasimlo ta îro jî çendîn hevalên wî yên Çek ne tenê di roja şehîdkirina wî de, lê herdem wî tînin bîra xwe. Li ser masa "Prof. Karel JECH" de hêjî wêneyê Şehîd Dr. Qasimlo dalaqandî ye! Di dema Komunîzmê de çendîn karbidestên Partiya "TUDEH" li Çekoslovakyayê dijiyan. Îro navê tu kesek ji wan, gelê Çekê nedizane ne jî wan tîne bîra xwe. Lê Dr. Qasimlo hêj çend neslên din di dilê hezaran Çekiyan de dê hebe, ji ber ku ew wî perçeyek ji xwe dizanin.

Dema mirov, mirovên din jî – bi bawerên olî, nîjadî yan îdeolojî – wek xwe mirov bihesibîne, wê demê gellek pirs bi xwe ji holê radibin.

Ji ber vê yekê jî Dr. Qasimlo di vê warê de kesayeteki bêhempa bû. Dihat nav kîjan civakekê, di nav demeke kurt de dibû yek ji wan be ku ji raman yan dîtinên xwe fedekarî bike. Ew hertim wek xwe dima, lê hergav jî bi her kesekî/ê re zimanekî hevbeş peyda dikir; çi jin, çi mêr, xort yan pîr, Kurd yan Faris, Ereb, Tirk çi Fransî yan Çek, kafir yan misilman, komunîst yan royalîst – Kralperest-.

Dr. Qasimlo li dinyaya derve çawa dihat û tê naskirin?

Weka ku min got, pir dostên wî, ew wekî kesayetekî mirovhez, demokrat, adil nas dikin.

Kesê/a ku ew nas kiribe – carekê tenê jî dîtibe – piştî ewqas salan jî ew ji bîr nekiriye. Ev jî nîşana mezinahiya kesayetiya Şehîd Dr. Qasimlo ye. Ew serok dewletekî mezin nebû, Şah, Şahinşah yan Kiral jî nebû. Lê wî xwe bi kesayetiya xwe ji yên dîtir dabû qebûlkirin, hezkirin.

Hêviyek mezin ya Dr. Qasimlo, navneteweyîkirina doza Kurd bû. Ji bo vê yekê çawa difikirî û xebatên wî çi bûn?

Dr. Qasimlo ji aliyekê mirovekî bêhempa bû, lê ji aliyê din siyasetvan û stratejekî gellek realîst bû. Dizanibû ku qawet û hêza gelê Kurd dest nade ku hember 4 welatên dîktator û antîdemkorat di eynî demê de şer bike. Di sala 1979-1980'an de, tenê konjukturê Îranê dest dida şerekî, bi vî şerî bala gelê dinê dikişand ser doza gelê Kurd. Bo wî tu perçeyên Kurdistanê ji yên din girîngtir nebû. Ji dil bawer dikim ku, ger Konjukturê Kurdên Bakur dest bida, Dr. Qasimlo dikaribû bi rehetî here li wir bo gelê xwe têkoşînê bike.

Dr. Qasimlo dizanibû ku Kurd mecbûr in bi

www.arsivakurd.org

cîranên xwe re di nav aşitiyê de bijîn. Heke Kurdistanekî mezin ava bibe jê bibe, cîrantî bê aşitî mumkin nine. Zehmetiya şerekî li hember 4 welatên dîktaror jî jê re nas bû. Ji ber vê yekê jî ew ***rojhilatnavîntî difikiriya*** ! Yanî wî ji bo gelên Rojhilata Navînê di nav saziyekî aborî wek Yekîtiya Ewropayê difikiriya û timî digot: *"heke welatên Rojhilata Navîn hinek demokrat bin, karbidestên wan hinek bi aqil werin ser hikmê û bi hev re yekîtiyekî aborî – Îsraîl jî daxil- saz bikin, dê di deh salî de, ji Ewropa di warê dewlemendiyê de pêştir bin. Îsraîl xizîneya mejî, tacir û zanistê ye. Gelên welatên Rojhilata Navîn dikarin ji wî gelî tiştan hîn bibin, nas bikin. Îraq, Îran, Kuweyt, Seûdî ji welaten dewlemend yên petrolê ne. Kurdistan welatê ziraet û avê ye. Tevde bibin yek, dê gelên vê herêmê jî îdî bikarin wek mirovan bijîn".*

Gava ku ez di sala 1991'an de çûm Îsraîlê û min di guftûgoyekê de dema ev yeka hanê ji Şîmon Peres bihîst, heyrî mam û mezinahiya Dr. Qasimlo careki din ji bo min geş bû.

Kêm kes îro dizane ku di sala 1958'an de rehmetiyê Mele Mistefa Barzanî gava ku ji Soviyetê vedigere Îraqê, berê tê Pragê dîtina Dr. Qasimlo û je re dibêje were tu jî bi min re vegere Îraqê û bibe Serokê Partiya Demokrata Kurdistanê. -Ne ya Îraq ne Îran, Turkiye û Sûriyê. Dr. Qasimlo jê re dibêje ku avakirina Kurdistanê di vê demê de wek welatekî gelêrî nemukin e. Ev dîtina wî rast derket. Konjuktura salên 60'î ne tenê bo avakirina Kurdistanekî mezin, ne misait bû, lê misaitê otonomiyekê jî nebû wek dîrok xwe nîşan da.

Piştî şehîdbûna wî, bona wê hêvî û xweziyên wî me çi kiriye? Kurdan çiqas dostên biyanî hene?

Malesef me çi nekiriye. Ev nîşana bêbextiya birêverên Kurd e. Tu car ji qîmetên xwe re xwedî derneketine. Ev kêmasiya gelêrî ya Kurdan ye. Ji tu tiştê xwe re xwedî dernakevin. Îro li Ewropa PEN'a Kurd heye. Endamên wê tevde nivîskar in û di dehan welaten Ewropî de dijîn, tu dizanî dehan zimanan dizanin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî wergerandine çend zimanan?

Enstîtuya Kurd a Brukselê beriya salan pirtûkek bi zimanê Filamanî derxist li ser Dr. Qasimlo û hw. Li Parîsê nikaribûn navê kolana ku mala Dr. Qasimlo têde bû, bikin ***"Kolana Dr. Qasimlo"*** yan li Diyarbekirê, Hewlerê, Pragê û wd. Ew kesayetekî Kurdistanî bû, ne tenê yê Rojhilatê.

Nikarin di Enstîtuya Parîsê, Berlînê, Stenbolê û Hewlêrê li ser raman, jiyana vî şexsiyetê navdar yê gelê Kurd xebatê bikin, semînara çê bikin û biweşînin?

Dost, heval û hogirên Dr. Qasimlo ku wek nîviya wî jêhatî nebûn, piştî hilweşandina komunîzmê bûn serok hikûmet, Serok Senato, Rektorên zanîngehan û serokên şîrketan. Çima tu kurdek nehat ew ziyaret nekirin, dostaniya wî berdewam nekirin?

Dr. Qasimlo kesek bû ku di dehan welatên cîhanê de, hezaran dostê wî hebû, wê demê de, dema ku telefona destan tune bû, fax tune bû. Lê îro ku li Ewropa sed hezaran Kurd dijî, çend dostê wan yê mezin heye?

Berhemeke Dr. Qasimlo teza Sosyalîzma Demokratîk e ku weke dirûşma Stratejîk ya PDK Îranê bo îdarekirina pêşeroja Kurdistana Îranê hatiye pejirandin. Hûn wekî Aborînasekê vê tezê li gor dema niha çawa dinirxînin?

Kesayetiyekî wek Dr. Qasimlo zû bi zû û di nav çend salan de pêk nayê. Berî her tiştî ew ji malbateke dewlemed dihat yanî arîşe û pirsgirêkên wan yên jiyanê tune bû, lê wî doza jiyana kesên bindest dikir. Her wiha ew ji herêmek pirnîjadî, pirolî û pirmesebî dihat. Li dora gola Urmiyê de Kurd, Azerî, qismên Faris û Cihû bi hev re dijîn. Dîsa wisa Şîe, Sunî, Cihû. Ji ber vê yekê her di zarokiya xwe de, Dr. Qasimlo hînî jiyanekî pirçandeyî dibe. Piştre tê Çekoslovakya Komunîzma real dibîne, nas dike û hîn dibe.

Dîsa şansê wî yê herî mezin ev e ku wek xwendekar dikeve zanîngeha herî navdar ya Ewropaya Navîn a aboriyê. Mamosteyên wî pisporên herî navdar in û ew in ku bihara Pragê dest pê dikin. Pisporên ewqaa zana ne ku teoriyên nû li ser aboriya sosyalîzmê pêk tînin û dibêjin ku teoriya ***"Karel Marx"*** îdî kevn bûye, pêwîstiyê nûjenkirina wê didin ber çavan. û dîsa wisa dibêjin ku eger ev pêk hatin, dê welatên sosyalîst hilweşin. Yanî ev pispor ewqas zanenin ku ji zanista sosyalîzmê re rêyekî nû vedikin, dixwazin vekin. Ev kes ji Rûsya, ji Polonya yan Bulgaristanê dernakevin, ji Pragê derdikevin û tev de jî yan dersdarên Dr. Qasimlo yan jî hevalên wî ne. Piştre di sala 1970'an de, Dr. Qasimlo diçe Îraqê û welatên Rojhilata Navîn, wan, pirsên wan û aboriya wan nas dike, îmkana muqayesekirina wan peyda dibe. Hevalên wî yên Çekî li Pragê di bin kontrola Polîs de ne û îmkanên wan ên pêşdaçûyîna di warê zanistê de kêm dibe. Dr. Qasimlo di dawiyê de diçe (1977) diçe Parîsê, Swêd û welatên din ên Ewropî. Li Swêdê û Almanya aboriya Sosyal Demokratan ji nêzîk ve nas dike. Di dema ku înternet tune bû, fax û îmkanên telefonê tune bû, mirov dikaribû zanînê tenê di kaniya wê de nas bike.

Ji ber vê jî teoriya ku Dr. Qasimlo ji bo PDK Îranê pêk anîbû bê guman baştirîn şeklê aboriyê ye û ne tenê ji bo gelê Kurd. Navê wê cuda jî bibe, ev teoriye roj bi roj dinyaya Kapîtalîst dike nav jinayana xwe. Yanî Dr. Qasimlo bi armanc û ramanên xwe re, deh salan pêşiya teorîsyenên aboriya Ewropî bû.

Mînak: her niha hikûmeta Almanya – ku Serok Wezîran "A. Merkel" ji Partiya Paşverû ye – biryar stand ku karkeran bike şirîkê şîrketên dewletê û şexsî. Yanî îdî karker dê bibin şirîkê Volkswagen'ê, Mercedes'ê, Simens'ê û hwd... . Ji ber ku ev bi kêmî 10 sal e aboriya Almanya di tengasiyê de ye, pêşda naçe. û wek çarê dawî aborînasên ku diji "sosyalîzma demokratîk" in jî, mecbûr in – navê wê cuda jî be – van şartan bi cih bînin. Bo domdariya pêşdaçûyîna aboriyê ev pêwîst e, wacib e.

Ev mînaka Almanyayê jî rastbûna teoriya Sosyalîzma Demokratîk a Dr. Qasimlo nîşan dide. Lê maalesef Dr. Qasimlo herdem gellek pêşiya dema xwe de bû û kêm kes rastiyên wî di dema xwe de fahm dikir.

Ger Dr. Qasimlo Fransiz, Alman yan Çekî bibûya, zû dê Xelata Nobelê bistanda yan bibû serokê hikûmetê yan dewletê. Lê ew Kurd bû, Kurd ma û hergav nasnameya xwe ya Kurdî dida pêş… .

Çawa bû ku we dest bi xwendina akademîk û xebat di warê aboriyê de kir? Xebat û çalakiyên we yên vê der barê de çi ne?

Di sala 1973'an de Mihemed Muhtedî, Mirhem Yîgît – berpirsiyarê Radyoya Mezopotamya – ez, Hecî Ehmedî û Cuma, me koma xebat û hînbûnê saz kiribû. Ez wê demê 20 salî bûm. Mihemed û yên din ji min mezintir bûn. Em heftê carekê du caran diciviyan û herkes ji şaxa xwendina xwe semînarek dirust dikir bo me. Ciyê civînên me odayên –xurfe– xaniya xwendekaran bû. Tê bîra min, min li ser teoriya "Darwin" semînar dirust dikir. Mirhem Yîgît li ser teoriya sosyalîzmê. Mihemed Muhtedî ku di zanîngeha Dr. Qasimlo de aborî xwendibû û xilas kiribû, li ser aboriyê semînar bo me dida. Cara pêşîn naskirina min a aboriyê bi vê minasebetê bû. Lê dawiyê ku ez ketim nav heval û hogirên Dr. Qasimlo – ku hemû aborînasên herî navdar bûn – jiyana min bû du perçe: **aborî û tendirustî**. Di dawiyê de min rêya hînbûna aboriyê bi metodên zanistî, Dr. Qasimlo ji min re vekir. Bi sebir û bi evîn.

Tiştê girîng ku jê hîn bûm ku bingeha her sîstema aborî ye. Çiqas di dîrokê de li hinek deman de îdeolojî derketibe ber aboriyê jî, ew derketinekî zorane bû. Bê çareserkirina pirsên aborî tu civakek nameşe, pêşde naçe. Bo pêşdaçûyîna aboriyê, şertê bingehîn beşdarbûna hemwelatiyan di nav îdare û mekanîzmayên aborî ne. Ev beşdarbûn jî bi xwe re demokrasiyê tîne. Dewlet tu car nabe demokrat, heger saziyên civakî nebin demokrat. Yanî demokrasî ji jor nayê jêr, lê ji jêr diçe jor.

Di kargehekê de demokrasî tune be, xebatkar beşdarê îdarê nebin, demokrasî jî nabe, ku demokrasî nebe, pêşdaçûyîna saxlem û xurt û berfireh jî çê nabe.

Hûn dikarin hinek li ser bîranînên xwe bi Dr. Qasimlo re biaxivin?

Rehmetî hertim rûken bû. Esilzade bû, esilzadetî di hebûna wî de hebû. Di sala 1975-1976'an de, me hevudin di hinek qehwexaneyên Pragê de didît – ji ber ku di derdora mala wî de hergav polîs hebûn -. Kîjan rojan me dê hevdu di kîjan qehwê da bidîtiba, berê de me tesbît dikir ku em bi telefonê re xeber nedin. Yanî hevdîtinên me "dizî" pêk dihat, lê rehmetî tim rûken, rehet bû, wekî ku em di qehwexaneyên Parîsê de bin. Di nav şer de jî wusa rehet û rûken, serê çiya de jî. Mezyeta herî xweş –ku di serokên Kurdan de yan nine yan jî kêm e – jî mutevazi bû, nefs piçûk bû.

Di jîna xwe de, di nav ewqas serokên Ewropî ku min nas kirin, du kes wek refmetî bûn: "Willy Brandt" û "Şîmon Peres". Lê farqa wan û Dr. Qasimlo ew bû ku Dr. Qasimlo hergav rûken bû ….

Niha pêwendiyên we bi malbata Dr. Qasimlo re çawa in?

Demekê – di salên 80 – de em ji aliyê cografyayê de ji hev dûr ketibûn. **Hîva** û **Mîna Xan** bi malbatên xwe re li Swêdê dijiyan, Nesrîn Xan li Parîsê û ez li Almanya. Lê piştî hilweşandina Komunîzmê (1990) em tevde vegeriyan Pragê. Sala berê Nesrîn (Helene) Xan çû Parîsê. Em dost-hevalên hev yên dehsalan in. Dostaniya wusa ya dehsalan di jiyana mirov de kêm e. Me salên zehmet di bin zilma rejîma komunîst dîtiye, bi hev re di xerîbiyê de jiyane … .

Di 18'ehemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo de, we çi gotinek heye?

Heviya min ew e ku gelê Kurd ji mezinên xwe re, dewlemendiya manewî ya xwe re xwedî derkeve.

Kesayetiyên wek Dr. Qasimlo di sedsalekê de carekê peyda dibe, nabe. Berpirsiyariya bilindkirina armanc û ramanên wî – ku hêj jî nemir in – li ser neslên nû de ye.

Mezin bi gelê xwe, gel bi mezinên xwe mezin dibin.

www.arsivakurd.org

Hilbijartina Seraserî Li Turkiyê Û Cîpêyê Kurdan Di Vê Hilbijartinê De

Sarîna
Wergerandin; Şehab Xalidî

Roja 22.07.2007'an, roja birêveçûna 22'emîn hilbijartina seraserî di Turkiyê de ye. Hevrikiyên hilbijartinê a partiyên Turkiyê ji mehekê berî niha ve dest pê kiriye. Di van hevrikiyan de, 7395 berendam ji bo bidestveanîna 550 kursiyên Parlemanê beşdariyê dikin. Ji van berendaman, 726 kes serbixwe û yên din ser bi 14 partî û saziyên siyasî bi bîr û ramanên cur bi cur in.

Li gorî rapora Civata Bilind a Hilbijartinan a Turkiyê, di roja 22.07.2007'an, 42533041 dengder nûnerên xwe ji rêya 158700 sindoqên dengan di 85 herêman de hildibijêrin.

Ev qonaxa ji hilbijartina seraserî a Turkiyê li gor qonaxên din girîngiyeke taybetî heye. Çimku bo yekemîn car e ku li dîroka Komara Layîk a Turkiyê de, di van 8 dehsalên rabihurî de bi vî awayî di navbera îslamxwaz û netewexwazên alîgirê cudahiya ol ji dewletê bona bidestveanîna piraniya kursiyên Parlemanê û herwiha bidestxistina piraniya dezgehên rêveberiyê valahî pêk tê.

Partiya desthilatdar di Turkiyê de bi rêberiya Receb Teyib Erdoxan di hilbijartina meha November 2002'an de, karî bi bidestxistina piraniya nêzîk bi tevahiya kursiyên Parlemanê 59'emîn kabîneya dewleta Turkiyê pêk bîne. Vê partiyê di 5 salên derbasbûyî de bi awayekê kar kiriye ku netewexwazên naskirî bi Kemalîzmê bi pêşeroja Komara Turkiyê nîgeran kiriye.

Partiya desthilatdar li Turkiyê di sala 2001'an de ji aliyê Receb Teyib Erdoxanê Serokwezîr û Ebdula Gul Wezîrê Karê Derve ê niha û hejmareke din ji kadroyên pêşîn ên Partiya Îslamî a Rifahê bi rêberiya Necmedîn Erbekan, Serok Wezîrê pêşîn ê Turkiyê ve hatiye avakirin.

Tevî vê ku di pirograma vê partiyê de çi basek li ser Îslamê û destêwerdana ol di nava kar û barên dewletê de nehatiye kirin û bingehên leyîkbûna Turkiyê nehatiye retkirin, lê pêşîneya rêberên vê partiyê û kiryarên pênc salênborî ên wan di nava dewletê û Parlemana Neteweyî a Turkiyê, careke din bîranîna kodîtayên Leşkerî ên vî welatî di dehsalên 60 û 70'an ên Zayînî de zindî dike.

Dewleta Erdoxan di pênc salên borî de, gellek kete nava hewildanan(fikaran) de ku lixwekirina Îslamî di cihên dewletî, zanîngeh û navendên din ên perwerdehiyê de azad bike, herwiha di encama siyasetên vê dewletê de girûpên Îslamî ên cur bi cur li derveyî dewletê rihekî nû bixwe ve girtine û Îslamxwazî di Turkiyê de bi awayekî berçav ber bi pêşve çûye.

Di radeya herêm û cîhanê de, têkiliyên Turkiyê bi Rojava re ne mîna caran in. Niha qonaxeke nû ji têkiliyên di navbera Enqere tevî welatên Îslamî û Erebî dest pê kiriye.

Di meha Nîsana îsal de piştî vê ku Îslamxwazan Ebdula Gul, Wezîrê Karê Derve bona Serkomariyê kiriye berendamê xwe, xwastin ku dest bi ser kela dawî ya netewexwazan de bigrin, wî çaxî Artêş di refa herî pêş ya netewexwazan de kete nava qada siyasetê de û di 27.04.2007'an de oltîmatoma dawî da Erdoxan ku heke pêyê xwe ji berika xwe (rayêxa xwe) zêdetir dirêj bike(rakêşe), dê berbirûyê kodetayekê be.

Ebdula Gul di yekemîn dora hilbijartina Serkomariyê de ku li Parlemana Neteweyî a Turkiyê de rêve çû, nekarî dengê hewce, yanî 367 dengê Parlemanê (2/3 ji sedê a dengan) bi dest bixe. Heke hilbijartin kêşaba dorên din, partiya Îslamxwaz a desthilatdar ku 354 kursî ji 550 kursiyên Parlemanê bi dest xistibûn, dikarî Ebdula Gul bigehîne posta Serkomariyê.

Posta Serkomariyê di Turkiyê de "Teşrîfatî"(bi berçav, rûyekî) ye. Lê bi baldan bi mafê wetoyê a Serkomar û girîngtir ji her tiştî, guherîna serokerkanên hêzên çekdar û berpirsiyarê Konseya Bilind a Ewlehiya Neteweyî mirov dikare bibêje ku bidestxistina posta Serkomariyê ji aliyê Îslamxwazan ve bi çi radeyekê girîngiya xwe heye.

Li pey oltîmatoma serokerkaniya hêzên çekdar bi dewleta Erdoxan, Dadgeha Bilind a yasaya bingehîn a Turkiyê, dora yekemîn ya Serkomariyê betal kir û dewletê ji tirsa kodetayê dema hilbijartina seraserî a bilez ragehand.

Netewexwazên Turk tevî vê ku di nava xwe de xwediyê bîr û ramanên cur bi cur in, lê ji tirsê guherîna Komara Turkiyê li hember Partiya Îslamxwaz a desthilatdar de yek helwêst girtine û bi armanca haydana (tûjkirina) hesta hevwelatiyan dest bi rêvebirina mîtîngên piştevanî ji Komarîtî û Laîsîtê kirine.

Rêveçûna mîtîngan di bajarên mezin ên Turkiyê heya radeyekê karî rewşa lerzok a netewexwazan xurt bike. Lê dîsan jî li gorî nirxandina nêrîn û ramanên xelkê partiya desthilatdar li pêş partiyên netewexwaz e.

Li gorî rapirsiyekê ku ji aliyê zanîngeha Selcûq a Qonyayê di 40 parêzgehên Turkiyê de hatiye kirin, partiya desthilatdar 38/8 ji sedê a dengan, Partiya Komariya Gel bi serokatiya Deniz Baykal ku partiya siyasî a herî kevnar di Turkiyê de ye û Mustefa Kemal Ataturk avakerê wê ye, 21 ji sedê a dengan û her yek ji partiyên netewexwaz ên demokrat û Hereketa Neteweyî 10/1 ji sedê a dengan destve tînin.

Carê derfet bo hilbijartinên seraserî mane û berhevdanên niha heye dema hilbijartinê mîna xwe namînin. Lê bi baldana bi pêşîneya Partiya Îslamxwaz a desthilatdar dîsan çavnihêrî tê kirin ku ev partiya piraniya dengên hilbijartina roja 22.07.2007'an bi dest bixe.

Di dema desthilatdariya dewleta Erdoxan de, ji bilî wan pirsên ku bûne sebebê nigeraniya netewexwazan, aboriya Turkiyê li gor qonaxên din bi awayekî berçav geşe kiriye û kiryarên di warê rihetî û xizmetên civakî de ji dewletên pêşîn baştir(bêtir) bûye.

Erdoxan yekemîn Serok Wezîrê Turkiyê ye ku bi awayekî fermî pirsa kêmaniyên neteweyî û bi taybetî pirsa Kurd di Turkiyê de wekî pirsgirêkekê ku hewce ye ji rêya demokratîk ve bihê çareserkirin, anî holê.

Pêkhateya siyasî-civakî a Turkiyê ku têkeliyek ji Îslamxwazên kevneşop û lîberal neteweyên rojavaxwaz in, ji her tiştî zêdetir daxwazkarê baştirbûna rewşa aborî û jêhelçûna radeya rihetiya civakî ye. Herçend serkevtinên partiya desthilatdar di warê aborî de, hêla jî xala herî xwedîhêz ya vê partiyê di hilbijartina 22.07.2007'an de ye, lê pirsa gefa li ser Komara Layîk û destkewtên wê ji aliyê Îslamxwazan ve heya radeyekê rewşa caran guheriye.

Heke partiya desthilatdar piraniya dengan jî bidest bixe, nikare wekî hilbijartina sala 2002'an ser bikeve û bi tenê dewleta 60'emîn li Turkiyê pêk bîne.

Kurd di hilbijartina seraserî ya 2007'an a Turkiyê de

Kurdên Turkiyê nêzîk bi yek ji sê a nifûsa 75 milyonî a Turkiyê pêk tînin. Lê

www.arsivakurdi.org

dîsan jî li gerên pêşîn de wan nekarî di çarçoveya partiyên Kurdî de herne nava Parlemana Neteweyî a Turkiyê de.

Li gorî madeyên yasayî ên Turkiyê, divêt partî 10 ji sedê a dengan bi dest bixin da ku herin Parlemanê, lewra ew madeya yasayî û zext û givaşa bê sînor a netewexwazan heya redeyekê bûye sebeb ku partiyên Kurdî nekarin herne Parlemanê, lê telabelayiya dengên Kurdên Kurdistana Turkiyê bixwe sebebeke girîng e ji bo vê ku partiyên Kurdî ser nakevin.

Di hilbijartina seraserî a sala 2002'an de, ji bilî Diyarbekir, Mûş, Mêrdîn û Adî Yamanê, di bajarên din ên Kurdistanê de, partiya desthilatdar bi rêberiya Erdoxan piraniya dengan bidestve anî.

Piraniya Kurdên Turkiyê piştevaniyê ji PKK'ê, dikin, lê di merheleya hilbijartinan de alîgiriya Îslamxwaziya Kurdên vî parçeyê Kurdistanê, dibe asteng û nahêle ku partiyên qanûnî yên ber dilê PKK ê biser kevin.

Partiya Civaka Demokratîk bi rêberiya Ehmed Turk ser bi Kurdên Turkiyê vê carê berendamên xwe bi awayekî serbixwe dayîne nasandin da ku heke nekarin radeya 10 ji sedê a dengan jî bidest bixin, lê bikarin herne nava Parlemanê.

Dadgeha Yasaya Bilind û Konseya Bilind ya hilbijartinên Turkiyê berendametiya pitir ji 50 kes ji endamên naskirî ên vê partiyê bo beşdarî di hilbijartinên Turkiyê yên 2007'an de ret kiriye. Sebebê retkirina berendametiya wan jî bi raya Dadgeha Yasaya Bingehîn, hebûna pêşîneyeke xirap a wan kesan e. Leyla Zana, Selîm Sadak, Orhan Doxan(ku çend rojan berî niha wefat kir)û Xetîb Dîcle ji nûnerên pêşîn yên Parlemanaê bûn ku bi sebebê berevanî ji mafê netewî-demokratîk yê Kurdan, 7 salan di girtîgehê de bûn, kêrhatîbûna wan jî hatiye betalkirin.

Serbarê vê yekê jî şansê serkevtina berendamên serbixwe ên Partiya Civaka Demokratîk li serê ye. Heke 30 kes ji berendamên vê partiyê di hilbijartina 22.07.2007'an de serkevin, vî çaxî Partiya Civaka Demokratîk dikare di hevalbendiya avakirina kabîneya xwe de, rolê xwe bilîze.

Partiyên din yên siyasî ên Kurd her wekî Partiya Maf û Azadî(HAK-PAR) di vê dora hilbijartinê de hizûrekî wisa nînin. Tenê Reşîd Delî berendamê vê partiyê bo nûneratiya bajarê Sêrtê navnivîsî kiriye.

Rewşa hilbijartina seraserî di Turkiyê de û telabelayiya dengên Kurdan bûye sebeb ku Kurd li hilbijartinên seraserî li gor nifûsa xwe dengên kêmtir bînin.

Şandekî PDK Îranê, Seredana Parlemana Ewropayê Kir

Şandeke PDK Îranê ku pêkhatibû ji Dr. Seîd Sultanpûr, berpirsê beşa pêwendiyên derve, Azad Ebdulahî, xatûna Şehîn Mehmûdzade, Meko Sultanpûr, Hejar Deştî û Aso Xusrewî, endamên YCDK Îranê, roja 27.06.2007'an, li ser gazîkirina fermî ya xatûna "Britta Thomsen", endama Partiya Sosyal Demokratên Danîmarkê û Perlemana Ewropayê, seredana Parlemana Ewropayê kirin.

Berfirehiya raporê di malpera me de bixwînin...

Gerrek Kurt Di Dîrokê De ...

Amadekar: Nûredîn Sofîzade

01.07.1985: Mîrza Ebdula cîgirê Fermanderê Hêza Şehîd Moînî li Hencîrana devera başûrê Kurdistana Îranê, şehîd bû.

01.07.1985: **Silêman Mampîrotî** Fermanderê pel ji Hêza Şehîd Moînî li devera Bane şehîd bû.

01.07.2004: Balefirxaneya navneteweyî ya Hewlêrê bi hildana Ala Kurdistanê û Amerîka bi beşdariya nûnerê zaf welatan hate vekirin.

03.07.: Roja Cîhanî ya Alîkariyê (teavon)

03.07.1984: Bi sedema êrîşa hêzên rejîma Komara Îslamî ya Îranê bo ser devera Şarwêrana Mehabadê, li gundên Daşxan, Xurxure û Gird Yeqob, şerekî dijwar di navbera Hêzên dujmin û Pêşmergeyên PDK Îranê ji Hêzên Pêşewa û Beyan ku têde sedan kes ji hêzên dujmin hatin kuştin, mixabin 25 Pêşmerge şehîd bûn:

Mihemed Emîn Birahîm Mîrza(Çirçe) Fermanderê Hêza Beyan, Tahir Xizrî, Hisên Qadirî, Cefer Kwêxa Îsmaîl, Xalid Ehmedpûr, Salih Menic, Elî Nûrî, Xizir Ebasî, Kerîm Îbrahîmî, Kerîm Axawelî, Osman Derwîşî, Emîr Rizayî, Ebdula Şerîfî, Xalid Serayî, Îbrahîm Salik, Seîd Îsmaîl, Elî Sermaye, Muhsin Gadanî, Mistefa Mihemedî, Mihemed Salih Ferecî, Hisên Vehdet, Silêman Golink, Seîd Cefer Îbrahîmî, Yosif Şerîfî, mixabin navê şehîdê 25'ê nehatiye.

04.07.1776: Ragehandina serxwebûna Dewletên Hevgirtî ên Amerîka ku 13 Eyaletan ew serxwebûn pejirandin û welatê Amerîkayê pêk anîn.

04.07.2004: Pêkhatina 13'ehemîn Kongireya PDK Îranê li bajarê Koyê. Di wê kongireya girîng û dîrokî de, dirûşma stratejîk ya partiyê bi: **"bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek demokratîk û federal"**de hate girtin. Birêz **Mistefa Hicrî** wekî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê hate hilbijartin.

06.07.1952: Dr. Mihemed Mosediq dest ji Serok Wezîriyê berda, lê dîsan bi piştgiriya xelkê,

Şah neçar ma ku dîsan Mosediq wekî Serok Wezîr diyar bike.

07.07.1908: Şerîf Paşayê Xendan ku balyozê dewleta Osmanî li Ewropayê bû, dest ji kar berda û kete xizmeta doza gelê Kurd.

09.07.1999: Xwenîşandaneke mezin ji aliyê xwendkarên zanîngehên Tehranê û yên piraniya bajarên din yên Îranê birêve çû ku çendîn rojan dom kir û tevî tepeseriya hêzên rejîmê berbirû bû. Bi dehan xwendkar hatin kuştin û sedan kes birîndar bûn û bi hezaran kes hatin girtin.

09.07.2005: Xelkê bajarê Mehabadê bo nîşandana nerazîbûnê li hember kuştina lawekî bi navê **Şivane Seyîd Qadirî** ji aliyê rejîmê xwenîşandan birê xistin ku bi awayekî tund ji aliyê hêzên rejîmê we hate tepeserkirin. Xelkê bajarên din yên Kurdistanê bo piştgirî ji xelkê Mehabadê xwenîşandan kirin. Di wan xwenîşandanane de ku nêzîkî mehekê dom kir, pitir ji 30 kes şehîd bûn.

10.07.1948: Dîroknivîsê Kurd **Emîn Zekî** koça dewiyê kir.

10.07.1984: Hemîd Kebûdvend, berpirsê Komîeyta devera Hevto û yek ji Kadrên herî jêhatî yê PDK Îranê, li devera Dîwandere şehîd bû.

11.07.1985: Hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê di doma cinayetên xwe li Kurdistanê de êrîş kire ser devera Geliyê Berdereş li herêma Tirgewer ya Urmiyê û 4 gund bi navên: **Cêrmê**, **Bêtkara**, **Bêgozan** û **Şerwîn** bi tevehî şewitand û wêran kirin û xelkê wan gundan derbider bûn.

12.07.2006: Bi sedema revandina 2 leşkerên Îsraîlê ji aliyê Hizbulaha Lubnanê, artêşa Îsraîlê êrîşa esmanî û erdî kire ser Lubnanê û piraniya bingehên stratejîk wek Balefirxane, Av, elektrîk û Pir ji nav birin. Di wî şerî de ku pitir ji mehekê dom kir, sedan kes bûne qurbanî.

13.07.1989: **Dr. Ebdulrehman Qasimlo** Sekreterê Giştî yê PDK Îranê tevî **Ebdula Qadirî Azer** endamê Komîteya Navendî, ji aliyê dîplomat terorîstên Komara Îslamî a Îranê li ser maseya gotûbêjê li Viyena paytexta Otrîşê hatin şehîdkirin.

13.07.1990: Li Perjaleya devera Seqizê bi hegera pîlaneke îxanetkarane 10 pêşmergehên PDK Îranê bi navên: **Seyfula Neilbendî, Mistefa Hacîzade, Xalid Şebanî, Fireydûn Qadirî, Davûd Palanî, Luqman Elyasî, Rehîm Bihanet, Xalid Ebdulahî, Cemal Kurtekî û Mihemed Sidîqî** şehîd bûn.

14.07.1879: Enternasiyonala Duyemîn ava bû.

14.07.1986: Rehîm Elîpûr, Fermanderê Lik ji Hêza Şehîd Moînî li Axelana Serdeştê şehîd bû.

15.07.1999: **Seîd Selam Ezîzî** endamê Deftera Siyasî yê PDK Îranê bi hegera nexweşiyê li yek ji nexweşxaneyên Bexdayê koça dawiyê kir.

HUNER

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Huner, afirîşa (xulqa) şêwe û awayên jiyana mirov a azad û rûmetdar e.

Mirov, ji roja ku xwe wekî mirov dîtiye û heta îro bi xurik û vexurikên ku ji xwezayê bi dest xistiye, jiyaye. Belê demeke domdirêj bi hest û hizrên xwesparî, radestî û bindestiyê rû bir û maye û gellek tiştên bihişmet ên xwezayê wekî afirînerê (xweda û xwedawendên) xwe dîtiye. Û hemû tiştên xwezayî jî wekî hunera afirînerên xwe qebûl kiriye.

Heçku huner, qet ne ew tiştên xwezayî yên ku xwe bi xwe pêk tên an ji xwe ber pêk hatine ne; berevajî wê, mudexaleya wan tiştên ku bi destên mirov an ji hêla mirov ve têne şêwandin e. Ango bi kurtayî huner, mudexaleya mirov a li hember xwezayê bi xwe ye.

Dîroka mirovahiyê bi nakokî û dubendiyên nelihev mişt tijî ye. Di her dem û domanê de gellek kes û hêzên paşverû li hemberî hewldanên hunerane derketine û ber û berhemên hunerî wekî bêsincî û derexlaqî dîtine. Civatên ku sinc û exlaqê xwe wekî tiştên pîrozwer dane rûnandin, ji afirînerî û behreyên hunerî dûr û bêpar mane û xwe di nava kevneşopiyên hezar salan de esirandine. Nivşên ku li hemberî hunerê bertek û reaksiyonên tund nîşan dane xwe di nava karesatên demê û pevçûnên civakî de dîtine. Wan, paşê xwe daye şaristaniyên gerdûnî û ji nirxên ku mirov dike mirov bi dûr ketine. Hê jî nizanin ku huner hem mirov arasteyî rûmet û serbilindahiyê dike û hem jî mirov ji hest û hizrên nepak, reha û bêrî dike.

Baş tê zanîn ku tu şaristanî bêyî hunerê pêk nehatiye. Mirovên berê yên ku xwe spartine şikeft û berqefên asê, pêşî li teht û hêtên şikeftan xêz û wêneyên ku di hest û hizrên xwe de disihrandin, çêkirine. Reaksiyona mirov a li hemeber xwezayê bi hunerê re der bûye. Û her wiha pirolekirina (mubalexeya) tiştên xwezayî jî dîsa bi saya hunerê pêş ve çûye. Huner, ne derpêşkirina tiştên xwezayî ye. Lewre tiştên xwezayî ji xwe hene û hêla herkesî ve têne zanîn. Huner vê yekê an diguherîne an jî mezintir nîşan dide. Ango huner ne wekî fotografê tiştên heyî ye; ew wêneyên wan e. Wêne, ne sûret an jî siya tişt e; lasayiya (texlîdê) tişt e. Ji ber wê ye ku huner bi vê taybetiya xwe balê dikêşe û mirov diheyirîne. Çawa ku tu kes li ber tiştên xwezayî heyr û hejmetkar namîne, mirov li hember fotografê mirovekî/ê jî zêde heyr û seyr nabe. Tiştê ku mirov heyr û hejmetkar dike ne sûretê mirov e; wêne an jî peykerê mirov e. Her wiha çawa ku di fotografê mirov de xweza dixuye, di wêne û peykerê mirov de jî huner xwe dide der. Ji bo wê, huner ne tiştekî xwezayî ye, çêkiriye; çêkirina ku bi afirîneriya mirov der bûye ye.

Tiştên ku mirov di hizra xwe de disêwirîne belê nikare bi awayekî aşkera derbibire, xwe li hunerê digire. Bi vegotineke din, hest û hizrên ku di hundirê mirov de hatine hecinandin, tepisandin û ewiqandin bi hunerê re der dibin. Huner, gellek caran tiştên ku aqil û hiş nagihêjê an jî hestên ku di dilê mirov de nasihire, dike. Lewre huner tenê ne behreya aqil û ne jî tenê ya hestê ye; ew behreya ku ji herduyan(hest û aqil) pêk tê ye. Huner çeqa hest û aqil e. Hunera ku ji hestê bêpar be qels, belê hunera ku ji aqil bêpar be jî kûd (seqet) e.

Huner, afirînerî ye. Afirîşa(xulqa) mirov ne huner e; huner, afirîndetiya mirov e. Di xwezayê de heyînê ku bikaribe hunerê biafirîne tenê mirov e. Lewre yê/ya ku hest û aqil pê re gihaye, mirov e. Yê/ya ku diaxive, difikire û diafirîne mirov e. Yê/ya ku tiştên ji xwe mezintir dike û diafirîne jî mirov e. Mirov, hem afirînerê hunera xwe û hem jî afirandiyê(mexluqê) hunera xwe ye. Tu tişt ji mirov ne mezintir heye û ne jî jê biçûktir. Tu tişt ne ji mirov birûmetir heye û ne jî bêrûmetir. Tu tişt ne ji mirov qelstir heye û ne jî xurtir. Tu tişt ne ji mirov xedartir heye û ne jî dilnermtir. Tu tişt ne ji mirov hovtir heye û ne şarezatir. Tu tişt ne ji mirov baştir hey û ne jî xerabtir…

Îcar tiştê ku mirov dike mirov yek jê behredariya mirov a hunerî ye. Huner, tehm û çêja jiyanê ya ku bi herkesî re peyde nabe ye. Huner, nîşaneya pêşveçûna civakê ye. Huner, pîvanga şarezabûna civakê ye. Huner, asta/merhaleya bilind a rûmetdariya civakê ye. Civakên ku ji hunerê bi dûr ketine, tu car nêzîkî aştî, azadî û aramiyê nebûne. Û her wisa ji hemû nirx û hêjahiyên gerdûnî û şaristaniyê jî bêpar mane.

Tiştê ku nikare xwe bigihînê mirinê huner e. Huner berxwedana li hember mirinê ye. Temenê mirov kurt, belê temenê hunera mirov dirêj e. Heke hunerdariya mirov tune be, çêj û wateya jiyana mirov û nav û dengê mirov jî tune ye.

Pexşan

Şehîd Qasimlo

Cawîd Esxerî

Guh bidê, îşev dilê min behreke tofanî ye, her çı reşebayên bi kerb û kîn û êş û jan in dest yê dayîne hev, bileztir gavan davêjin.

Îvşev rondikên çavên min hişk bûne, li cihê rondikê çavan, serê pênûsa min hêsirên sor dibarîne.

Dest bilind dikin, pencên dest xwar dibin, deng bilind dikin û dikin hawar, qirik hişk e û peyv jı dilerizin... evro bûyereke dilêş û dil tejî ji jan û bawernekirî, me dibe cem dîroka tejî jan û doman, jar û belengaz bi qasê şeva çirayê bajarê koran, me dibe cem canê bi xwînkirî ye egîd û mêrxasan, lawê leheng û qehreman ê Kurdistanê, di nav bax û rez û darên Viyenê de, helmebayê azadiyê ber çavê me digire, hêdî hêdî, dem bi dem, xwîna germ ya tejı hemase û berxwedan ya wî, hêvî û xwestekên mezin ên wî, pêngavên pir heybet û nemir ên wî bikeve bin xem û evrên reş û rûyê sipî û geş yê wî bipeçivîne.

Lê binêrin! Bi mirî jî canê tezî û serhildan û jîna duhî ya wî, ken û girnijînên wî cerg û hinavên reş pirtı pirtî dike.

Ax... Ax... duhî li bihostek axa vê Kurdistanê, dı rêya wê de serê rêz û serfiraziyê kurnoj kir, di rêya wê mista axê de ku xwîna xwe da, kevirê çepera berxwedaniyê çê kirin, her li wê bista axê, termê belengaz û pir xerîbatî yê strana serekvtinê digot.

Hey mêrxasê gerîde û belengaz, xwedan Kurdistan, tu dizanî her ku li derê mal derketî û ketı rê, bo aliyên cihê ku serkevtin û hizr baweranîna azadiyê bî, ketiye rê bo aliyên cihê ku mizgînanîna rizgariyê bî, lêbelê dijminê xwînmij û qirêj kemîna merg, bi navê gotûbêjê bo te danî bûn û tu şehîd kirin.

Lewra qetla wê rojê, guleyek berda hemû aştiya cîhanê û aştî kuşt. Kesê xwînrêj û mirovkuj qedrê aştiyê nizanin û ew tim xwînê dimijn.

Qasimlo! tu gula bêhinxweş û xweşik ya aştiyê bûyî, lê neyarên mirovahî û biratiyê, bi destên xwe ên qirêj û mirar tu şehîd kirin, wan wisa dizanîbûn ku bı şehîdkirina te dê bikaribin gelê Kurd ji rêya aştî û rizgariyê vegerînin û pêşiya rêbaza azadî û demokrasîxwaziyê bigirin û bibin asteng, lê xeyala wan xaw e, ew ji tirsan dikujin, ji bihostan xwînê dirêjînin, mohra îxanetê li nav çavê xwe didin û hetanî mirinê dê bi rûçikek reş û sernişîv bijîn, lewra îxanet ji kesê re namîne kar.

Qasimlo! Xatircem be, bêxem binive, hevçeperên te rê û rêbaza te ji bîr nakin, hertim dê bidomînin. Niha dar û ber û kestekên axa Viyenê şermezar in, rûreş in bi qasê hizr, bîr, bawer û hêviya te, bi qasê xwîna germ û sor ya te. Lêdana dilê te bombeyeke mezin e û dilê mirovahiyê dihejîne. Hizra te dunyayeke mezin e. Cimcimê serê dîroka ji ber tûrebûna jiyanê li ber pênan dide.

De lorî, lorî, li wê axa tejî hesret de, jîn û berxwedana me dê biguherî.

Qasimlo! Tu şehîdê welat, qet namirî, tim bi tim tu di nav dilê Kurdan de dimînî, îro em ji bo te nakin şîn û giriyê, lewra dem ne dema girîn û rawestiyanê ye...

Niha jî welatê me di bin postalên dagirkeran de dinale.

Qasimloyê nemir! em baş dizanin ku dijminê xwînrêj dê rojekê nav xwîna xwe de bigewize û winda bibe û hêvî û armancên te û hezaran şehîdên rêya aştî, azadî û demokrasiyê bên cî.

Soz didim ku hetanî serkevtina armancên te dest ji berxwedan û tekoşînê ber nedim û her tim rê û rêbaza te armanca jiyana min be, Qasimloyê şehîd û nemir...

www.arsivakurd.org

Şanoger, Fatih Salihî:

“Kurd Hêşta Ne Xwediyê Sînemayê Ne”

Xwandevanên hêja, Şano û sînemaya Kurdî di van çend salên dawî de kariye bi awayekî berfireh pêş bikeve û gellek xelat û destkevtên mezin û navneteweyî ji bo sînemaya Kurdî bi dest bixe û ji rêya vê hunerê de doza gelê Kurd bi cîhanê bide nasandin. Lewra me bi hewce zanî ku derheq rewş û zirûfa şano û sînemaya Kurdî û herwiha asteng û pirsgirêkên li hember vê hunera girîng nemaze li Kurdistana Rojhilat, bi Fatih Salihî re, pispor di warê şano û sînemayê de, hevpeyvîneke pêk bînin. Li vir emê bi hevre vê hevpeyvîna taybet bişopînin:

Hevpeyvîn/ Dara Natiq   Wergerandin / Nizar Sîtewo

Fatih Salihî, Kî Ye?

Ez ji dayîkbûyê sala 1357(1978)’an, li bajarê Seqizê me. min Xwendina xwe ya destpêkî, navendî û paş navendî her li wî bajarî bidawî anî. Sala 1375(1996) heta 1378(1999)’an, di şaxa “Mudîriyet a Dewletî” de min di zanîngehê da xwend. Piştre sala 1999-2000’an de, ez bo qonaxa karnasî ya derhêneriya şano û televîziyonê ji aliyê Binkeya Hunerên Diramatîk a Wezareta Çandê ve, çûme zankoya hunerên diramatîk a Zanîngeha Tehranê ku piştî 4 salan min karî belgeya derhênanê ya pileya yekem werbigirim. Ji sala 1369(1980)’ê heya niha, mijûlê karê şanoyê me, heya niha di çendîn festîvalên mezin û bi nav û deng de beşdar bûme, çendîn xelat û dîplomeya Şanaziyê jî min wergirtine. Herwiha heta niha wekî hevkarê derhêner beşdarî du fîlmên **“Çirîkey Ahû”** û **“Awat”** bûme, di çend karên televîziyonî yên kanala “SAHAR”ê de jî beşdar bûme û min wekî ekter kar kiriye. Midehekê jî min ji televîziyona “Herêm” ya Kurdistanê re bernameyên zarokan birêve birine û çê kirine.

Hûn çawan pênaseya şanoyê dikin?

Ez bawer im şano hunereke zindî û mirovî ye ku ji aliyê meriv ve tê nîşandan û qala arîşe, pirsgirêk, hêvî û daxwazên meriv û civaka mirovî dike. Ji ber vê çendê ku şanoyê her heft huner di hembêza xwe de girtine, weke dayîka hunerê tê nasîn û bi yek kilam dikarim bibêjim ku di cîhana îro de, huneraşanoyê weke sembola çandî dı cıvakan de tê nırxandın. Sînema hunera heştem û nûjen a îro ya civaka cîhanî ye. Sînema pîşe ye û hunera ne rasterast û ne zindî ye. Lê bi hizra min bandora wê li ser civakê, ji hemû hunerên din zêdetir e û temaşavanên zaf li dor sînemaya îro rojê kom bûne, serbarê vê çendê ku her weke min pêştir jî qala wê kir, pîşeyek e ku dikare heyîn û dirav pê were derxistin û komkirin.

Nêrîna we li ser şanoya kurdî çawan e û îro çawan şanoya kurdî dinirxînin?

Berî ku ez bersiva vê pirsyara we bidim, hewce ye bêjim ku me tu tiştek weke şanoya Kurdî tu nine, ji ber ku şanoya Firansî, Amerîkayî û Almanî jî tune ye. Çimku şanoyek bihêz e ku netewe û sînoran nas neke. Hekene şanoya Kurdî jî weke Kabokî, Katakalî, Mihabarata û heta teziye(tazî) yên Îranê jî diçin nava refên rê û resmên olî û êdî nikarin weke şano ku bingeha wê gotubêj e, jê were mêzekirin. Lê serbarê vê hindê jî, di nava Kurdan de şanoyê kariye cihê xwe bike, nemaze li Kurdistana Îranê de. Me niha çendîn doktorayên pispor û bi dehan karnasên Kurd ên şanoyê, di Îranê de hene. Berpirsê Yûnîma ya cîhanî, **Bêhrûz Xerîbpûr** e ku yê bajarê Sine ye. Şanoya ku niha Kurd pêşkêş dikin, çi kêmtir nîne ji şanoya Îran û cîhanê.

Divêt çi taybetmendiyek di zimanê şanoyê de hebin?

Ya baş ewa ye ku di vir de bêjim zimanê şanoyê, çimku şaş e, bêjin şano. Şano ji Firansayê hatiye wergirtin û rehmetiyê Goran, aniye nava zimanê kurdî. Şano ew cihe ye ku nimayîş tê de nîşanî bîneran tê dayîn ku em jê re dibêjin Sên yan Seko. Îca baştir e ku ji peyvên şano yan nîmayişê mifah were standin. Bi hemû terzekê zimanê şanoyê, zimanekî wêjeyî ye û li gor awayên cur bi cur xesmaniyên cuda hene. Şano zimanê axavtina gel e, bi awayekî zanistî û her weke min got, wêjeyî ye.

Hûn ne li ser vê baweriyê ne ku di şanoya kurdî de tiştek bi navê kirîz heye? gelo heke heye heger û çareserî çi ne?

Bêguman her niha jî ku ez bersiva we didim, di Kurdistanê de şano rastî kirîzê hatiye. Her parçeyekê ji Kurdistanê kirîzên taybet bi xwe hene. Bi sedema desthilata Ehmedînejad, di Kurdistana Îranê de niha naveroka wan şanoyan ku tên nîşandan, ji aliyê berpirsan ve tên diyarîkirin û ji ber nebûna alev û amûrên hewce û piştevaniya malî û girîngtir ji hemûyan azadiya derbirîna bîr û rayan, şano rastî kirîzeke bingehîn hatiye. Di Kurdistana Îraqê de jî, ji ber nebûna temaşevan, şano di kirîzê de ye. Li Kurdistana Turkiyê her du fakterên han berçav in. Belê di Kurdistanê de şano niha tevî kirîza hebûn û nebûnê, berbirû ye. Dewletên dijî Kurd, ji şanoyê û berfirehbûna hesta şoreşvanî û mirovî, zaf ditirsin û evayê bûye hegera bextreşiya şanoya Kurdî.

Çi rêbazek di nava rêbazên şanoyê de tevî rewşa me ya ruhî û derûnî tê(digunce), heta derhênerên kurd li ser bixebitin?

Ez bawer im ku hilbijartin û destnîşankirina rêbazên şanoyê, dikeve ser derhêneran. Lê eva ku berçav e, li gor şiyan û delîveya hewce, mirov dikare ji hemû terzan mifahê bistîne. Ez weke xwe pêşniyara Şanoya Grutêfsik ji bo zirûfa îro ya Kurdistana Îranê dikim. Ji ber ku him pêşkevtî û him jî di bingeh de ne hewceyî tu cure alevekê ye.

Huner heta çi astekê hevrê û girêdayî bi dîrokê ye?

Di hunerê de dîrok xwedî janreke

xasmanî ye. Çimku me hunera dîrokî heye, şanoya dîrokî, mesebî û civakî jî me heye. Huner pitir ji vê yekê ku tevî dîrokê rikeber be, tevî siyasetê rikeber e, niha jî her rikeberiyê dike û dê di pêşerojê de jî her bike. Bi hizra min huner parek e ji dîrokê.

Ji bo ku were selimandin ku kurd di şanoyê de xwedî pêgeheke dîrokî ne, çi belgeheke nivîskî anku dukomêntî heye?

Bi giştî temenê şanoyê cem Kurdan negihîştiye 100 salan. Ewa ku weke belge be, komek ji nivîsan in ku ji me re didin kifşê ku yekemîn şano sala 1315'an a Rojî, di Karwanserayeke bajarê Sine de hate nîşandan, piştre li serdemê Komara Kurdistanê de. Di vir de, ez "Bûkebaranê û Kose" bi şano nahesibînim, hekene dîroka wê diçe sedan salan berî niha.

Di awayê wan şanoyan ku heta niha derhênerên kurd ji bo darêtina nimayîşnameyan (senaryoyan) pêşkêş kirine, teknîk û teknolojiya Rojava çiqas bi kar hatiye?

Piraniya awayên şanoyê yên cîhanê weke teorî wergeriyane ser zimanê Farsî û derhêner û hogirên şanoyê jî mifahê jê werdigirin, lê standina mifahê ji teknolojiya Rojavayî, hewceyî pereyeke zaf e û eva jî di Kurdistana Îranê de bo derînerekî/e Kurd, ne mumkin e. Li Tehranê derhînerên Kurd zaf mifah jê standine, bo mînak Bêhrûz Xerîbpûr, ji bo şanoya "Rostem û Sohrab" Bûklekaniyan li Otrîşê çê kirin û heta dîkorên wî jî, yên Otrîşê bûn. Wiha ye ku di darêtina deqa şanoyê de, mifah ji awayên nûjen tê standin, lê di dema birêvebirinê de, neçar in ku weke Kurdekê bê emraz jê mêze bikin. Helbet di Kurdistanê de ne, li Tehranê.

Hin bas di vê dawiyê de tên kirin, gellek kes dibêjin ku kurd hêj ne xwediyê sînemayê ne û sînema ne taybetî me ye, hin kes jî dibêjin ku kurd xwediyê sînemaya xwe ne, di vê derheqê de we çi gotinek we heye?

Ez jî li ser vê baweriyê me ku Kurd hêşta ne xwediyê sînemayê ne, ji ber ku di hemû Kurdistanê de ceribîngehek sînemayê nahê dîtin. Tenê hebûna holên sînemayê yan çêkirina çend fîlman bi zimanê Kurdî û nasnameya Kurdî, nabe sedem ku em bêjin Kurd xwedî sînema ne. Weke Kurd, hêşta em ne xwediyê akademiyaya sînemayê ne. Lê di van salan de, çend fîlmê dewlemend ên Kurdî derketine ku her weke ku min berê jî got, nabin belge ji bo ku em xwedî sînemaya serbixwe bin. Li hemû Kurdistanê bigere, çend heb Kamêrayên sînemayê nabînî, heta çend aparatên modern jî tê de ninin. Îca hûn bi xwe hûr û gir bikin ka gelo em xwedî sînema ne yan ne?

Alav û mercên hewce di pêşdeçûna sînemaya kurdî di astê hunerî û zanistî de çi ne?

Berî her tiştekê em hewcederê zanista sînemayê ne û ji bo vê meremê jî divêt ku me akademî û zanîngehên sînemayê hebin. Piştre em hewcederê ceribîngehên sînemayê ne. Îca me hewceyî bi kamêrayên nûjen û taybet bi çêkirina fîlmên sînemayî

Tenê hebûna holên sînemayê yan çêkirina çend fîlman bi zimanê Kurdî û nasnameya Kurdî, nabe sedem ku em bêjin Kurd xwedî sînema ne

heye. Dawiyê jî em pêdiviyê bi nivîskar, derhêner, ekter û girûpên teknîkî yên sînemayê ne.

Mixabin ku hêj me Kompaniyayên berhemanîna fîlmên sînemayî tu ninin û hemû fîlmên ku heta niha bi zimanê Kurdî berhem hatine, berhemên Kompaniyayên bîhanî ne. Ji hemûyan girîngtir, holên sînemayê ne ku mixabin di seranserî Kurdistanê de 5 hol nahên dîtin.

Hûn bewer in ku sînemaya kurdî di sedsala 21'an de, pêşdeçûneke berçav bidest xistibe?

Min di bersiva pirsiyarên din de jî got, me sînemaya Kurdî tu nine, heta heke nîşandana bextreşî û kul û derdên gelê Kurd û paşdemayîn di warên çandî, civakî, aborî û siyasî de bibe janerek ji bo sînemaya Kurdî, ez bi xwe hez ji vê sînemayê nakim. Mêze bikin, sînemaya Halîwod heye ku bi hemû awayekê çarçoveyeke naskiri ye. Sînemaya Balîwod jî bi heman terzî. Lê car din tînim ziman ku tenê bi çêkirina çend fîlmên bi zimanê Kurdî ku heta xwedî hizra Kurdî jî ninin, em nabin xwedî sînemaya Kurdî. Lê heke dîtingeha derhênerên Kurd ku hejmara wan nagihîje 4 kesan jî, li gor rastiyan û rewşa niha ya Kurdistanê guhertin bi ser de were, hêvîdar im ku pêşerojê dîmenekî ciwan ji gelê Kurd bibînin û pênaseyekê ji sînemaya Kurdî re çê bikin.

Di wê dawiyê de sînemaya kurdî kariye xwe bigihîjne asta navneteweyî, di piraniya festîvalên cîhanî de beşdar be û serkevtinan bidestve bîne, tu ji serkevtinên han çawan mêze dikî?

Belê rast e, lê ne weke sînemaya Kurdî, weke sînemaya Îranê, çimku ew çend fîlm ku di festîvalên bi nav û deng ên cîhanî weke **Kan** û **Sensêbastiyên**'ê de beşdar bûn, bi nûneriya sînemaya Îranê çû bûn. Her çend ku di kakil de wan qala pirsgirêka Kurdan dikirin û li ser wê bingehê hatibûn çêkirin. Ez bawer im ku destkevtên han ji bilî armancên hunerî, armancên din jî pişt perdê hebûn ku ez hez nakim di vir de bas jê bikim. Lê bi giştî cihê keyfxweşî û rezamendiya gelê Kurd e ku Kurdek dikare di asta navneteweyî de bi awayekî herî baş xwe bide nîşandan û naskirin. Her çend bi buhaya gorîkirina çanda gelê xwe.

Raya te çiye li ser vê yekê ku tê gotin Behmen Qubadî, derhênerê serkevtî yê sînemaya kurdî ye û kariye ku caneke nû bide sînemaya kurdî û herwiha di rêya vê hunera xwe de dengê belengazî û bindestiya gelê kurd, bigehîne cîhanê?

Eva basekî yek car zaf bi xwe digire û ew pirsiyare bi xwe dikare bibe mijara gotûbêjeke berfireh. Di vir de tenê ez dê bîr û raya xwe bînim ziman. Belê rast e ku Behmen Qubadî, niha yek ji lehengên sînemayê ye. Lê bi hizra min Qubadî, tevî êş, jan û xizaniya gelê Kurd miamile(alvêr) kir û ji bo nasandina çanda Kurdî, nemaze di fîlma "zemanêk bo mestiyê espekan" (demek ji bo mestiya hespan) de, Kurd bire serdemê xwecihên Amazonê û rizgarî û serkevtinên gelê Kurd di fîlma "Kûsî Jî dikarin bifirin" de, goriyê tirs ji Komara Îslamî kir.

Hez dikim hûn temaşeyî fîlma "Textê Siyah" (Texte Reşê), berhema xatûna Semîra Mexmelbaf bikin. Behmen Qubadî, bixwe di sikansekê de rol dilîze, wê demê fantaziyaya wî binirxînin ku di wê fîlmê de hevkarê yekem yê derhêner bûye. Mêzeyî "Awazhayê Serzemînê Maderiyê Men"(Stranên welatê diya min) bikin. Di heman demê de jî temaşeyî fîlma "Çirîkey Hewram" a berhema Mêhranfer, bikin. Ji we re derkeve ku fîlma Kurdî û hizra Kurdî çi ye? **Dîwar** û **Rê** yên Yelmaz Gûnay, jî bibînin. Mixabin hêşta min berê xwe nekiriye "Nîmêyê pênhanê mah" (Nîva Veşartî ya Heyvê) û nikarim li ser berhema dawiyê ya Qubadî, biaxivim. Lê hêvîdar im weke berhemên bêre nebe. Ji ber ku tenê mêzeyî aliyên sembolîk bikin û fîlma " Kûsî jî dikarin bifirin", şirove bikin, bêguman dê du rengî di bawer û berhevdanên we de derheq Qubadî çê bin. Lê belê, serbarê vê hindê jî, ez weke kesekî ku ez ji destpêka salên 70'an ve, Behman Qubadî nas dikim, rêz û hurmeteke mezin jê digirim û hêvîdar im ku rojekê xelata Oskarê jî werbigre. Ez ne pir dûr dibînim, heke ew wekî xwe û ji bo gelê Kurd bîr bike.

Bi hizra te, heya çiqasekê sînemaya kurdî kariye bandor hebe li ser pêşdebirina pêvajoya tevgera rizgarîxwaziya gelê me?

Hêvîdar im ku di pêşerojê de rolekî ektîv bilîze. Çimku weke Arto dibêje: "Şano helbesta şoreşê ye." Bi hizra min sînema ji şanoyê bihêztir e

Di dawiyê de, we çi gotinek ji hogirên sînemaya kurdî re heye?

Hêviya serkevtinê ji wan re dixwazim, di hemû warên jiyanê de, ji we jî spas dikim ku we derfeteke wiha da min. Her bijîn û serkevtî bin.

Têdîtin: Berpirsiyariya naveroka vê hevpeyvînê, birêz Fatih Salií ye û dîtin û nêrînên wî ne. Gotinên wî ne siyasetên rojnameya Agirî ne.

www. ... .org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com

Orkestra Jêdar A Kurd Li Viyenayê Xelata Duyê Girt

Di yekemîn Festîvala Navneteweyî a Muzîkê ya **Summa Cum Lude** li Viyana 2007-ê de Orkestraya Jêder a kurd xelata duyê wergirt. Festîval li Paytexta Awusturyayê, li Golden Hallê di rojên 9-11.07.2007-ê de pêk hat. Orkestraya Jêder a kurd roja 10-ê mehê konserta xwe da û berhemên xwe pêşkêş kirin. Orkestrayên hemû welatan bi vî awayî derketin hemberî guhdaran.

Hêjayî gotinê ye ku nêzîkî 2700 kesayetiyên navdar yên ji seranserê dinyayê amadeyê festîvalê bûn û guhdariya orkestrayan kirin. Nûneratiya balyozxaneya Îraqê, nûnerê Derve yê Hikûmeta Kurdistanê û hin kesayetiyên kurd jî di festîvalê de amade bûn. Xelata yekê orkestraya Almanî ya bi navê **Puchheimer Jugend Kammer Orchester** wergirt.

Di vê festîvalê de orkestrayên ji Awusturya, Amerîka, Almanya, Awustralya, New Zeland, Çîn, Ukrayna, Koreya Başûr û Hollandayê jî beşdar bûn.

Orkestraya Jêder bi vê serkeftina xwe bi serbilindî vegeriya Kurdistanê û li Hewlêrê bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin.

Heft Ecayib(Seyr û Semere) Ên Nû Yên Cîhanê

Heft Ecayibên nû yên cîhanê bi dengê 100 milyon kesan û ji rêya telefon û peyaman ve hatin hilbijartin. Di halekê de ku îsal tu yek ji heft ecayibên berê nahên dîtin.

Ev prosesa diyarîkirina heft ecayiban ji sala 1999' ê ve ji aliyê **Birnard Wîbir** yê swîsî dest pêkiriye û hetanî niha zêdetir ji 200 şûnwar û cihwarên seyr û ecêb yên dinyayê hatine berbijar dan. Dengdan bo vê prosesê jî ji sala 2006'an ve dest pêkir.

Heft Ecayibên berê pêkhatibûn ji: Minareya Eskenderiye, Peykera ziyos, Peristgeha Artmîs, Baxçeyên Babilê, Peykera Rûds, Mezarê Halîkar Nasûs û sêkoçik(Herem) a mezin a Cîze.

Lê heft ecayibên nû pêkhatine ji: Dîwarê mezin yê Çînê, Şûnwarê Kulsiom li Romayê, Şûnwarê Tacmehel li Hindê, Xerabeyên Pitra li Urdonê, Peykera Mesîh li Berazîlê, Xerabeyên li Bajarê Maço Pîkço li Pêro û bajarê dîrokî û bastanî yê Çîçin Îtza li Mekzîkê.

Hêjayê gotinê ye ku rê û resma hilbijartina heft ecayibên nû yên cîhanê li peytexta welatê Portoxalê de birêve çû û bi awayekî zîndî di 170 welatên dinyayê de bo 1 milyard û 600 milyon kesan belaw bû.

Xiyar Dermanê Şekrê

Zana û pisporên warê saxlemiyê eşkere kirin ku mîweya Xiyar, qasekî zaf Vîtamînên (A,B,C) û herwiha Kelsiyom, Fisfor, Kibrît, Asin û Mengeniz têde heye, lê mîna gellek mîve û pincarên din çir e.

100 girem xiyar tenê 20 kaloriyan dide û mîdê mirov pê diperçive û hez û xwesta xwarinê kêm dike, çunku mehandina wê xaw e û renge 8 seetan li mîde de bimîne.

Xiyarê sûd û mifahek baş bo nesaxiya Şekirê heye, çunku cure vîtamînek têde heye ku malên leşê mirov diparêze. Madeya kibrît jî têde heye ku bedevî û ciwaniya çerm(pêst), pirç û nînikan diparêze. Xwarina wê bo zarok û kalan jî baş nîne, çunku mehandina wê giran û zehmet e, herwiha bo kesên ku nesaxiya Mîde(Gede) hene, xwarina wê nebaş e.

Herwiha zanayan eşkere kir ku ger xiyar tevî şîr yan mast bê xwarin, eva tênîtiya mirov dişkîne û demaran aram dike.

Li Goristana Pirlaşizê Şehîdên Viyenê Hatin Bibîranîn

Roja 18'ê Tîrmehê ji aliyê nûneratiya PDK Îranê li derveyî welat, rê û resmek berfireh bi beşdariya partî û aliyên siyasî û kesayetiyên Îranî û Kurdistanî û herweha endam û alîgirên PDK Îranê, li Goristana Pirlaşizê de bi boneya 22' Pûşperê, 18'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalê wî birêve çû.

Beşdaran bi danîna destegulan, emegnasiya xwe derheqî yad û xebata wan dubare kirin û piştre jî kek **Hesen Şerefî**, Cihgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, di axaftinekê de sopasiya beşdariya şandên partî û aliyên siyasî û bi giştî behîdaran bona hevxemiya wan di bîranîna nemir Dr. Qasimlo de kir.

Herweha di axaftina xwe de bal kişande ser taybetmendî û kesayetiya şehîd Qasimlo wekî mirovekî demokrat, azadîxwaz, rêber û xebatkarekî jêhatî û siyasetvan û dîplomatek çeleng...

Piştre nûnerên partî û aliyên siyasî peyamên xwe bi vê hincetê pêşkêş kirin ku ji wan nûnerên:

Hevbendiya Fedayiyên Xelqê Îranê, Yekêtiya Nîştimanî ya Kurdistanê, Partiya Demokrat a Kurdistanê, PSK(Turkiyê) û herweha Şandên: Enistîtuya Kurd ya Parîsê, Hevalbendiya 11 partî û rêxistinên Siyasî ji Kurdistana Turkiyê, PDK- Bakur, Civata Lêkolînvanên Îranê û Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê.

Her wiha li welatên Swêd, Norwej, Fînland û wd..., semînar û çalakî hatin lidarxistin.